PolitikART


KOVARA MEHANE YA WÊJE HUNER Û RAMANÊ

09 Îlon 2023 Şemî

HEJMAR : 320

# Bîr û huner

## ji hepsê û derveyî wê



BERG: Sînan Hezer

# Têkoşîneke ✧✧✧✧ xweşik ✧✧✧✧✧ wêrek ✧✧✧✧ û zelal

Jiyan ji bo her cureyê hebûnê yek e. Bi bayekî tenik tê û dide pey mijeke tûj û diçe. Li gorî hin kesan armanca jiyana bûneweran mirin e, li gorî hin kesan jî jiyan eksa li dijî mirinê ye. Şerê di navbera jiyan û mirinê de ji destpêka hebûnê heta îro her dewam dike. Diyalektîk ev e; ne ti carî mirinê serketineke teqez bi dest xistiye ne jî jiyanê şiyaye mirinê têk bibe. Hal û wextê hebûnê, her ev bûye.
Liv û tevgerên tevahiya cureyên ku hebûna xwe saz kirine, hemûyan, di navbera jiyan û mirinê de xalîçeyekê dineqişînin. Ez, tu, em; masî, çûk, fîl; kes, civak û alem; em hemû di nav sînorên mirin û jiyanê de tevdigerin. Lê azadî?
Hebûn ne hêsan e, hebûneke azad jê zehmettir e. Lewma şerekî mîna yê di navbera mirin û jiyanê de, di navbera azadî û bindestiyê de jî hebûye û hê jî heye. Masî ji bo asoyên nû ji avê derdikeve, çem ji bo rêyên nû dipêle, dar bilindî asîmanan dibe, mirov têdikoşe…
Hebûn û azadî, ango hebûneke azad ji bo civakan jî bivênevê ye. Xweparastina civakê xwezayî ye, peywireke hebûnî ye. Lewma îro gelê Kurd jî ji ber ku bi her awayî di bin êrişên tinekirinê de ye di nav parastineke hebûnî de ye.
Ji destpêka dîroka ku tê zanîn heta îro, Kurd ji bo man û nemanê têkoşiyane; li zindanan, li serê çiyayan, li bajaran… Ev rewş îro jî ne pirr cuda ye. Lê êdî şewqa azadiyê zelaltir dixuyê. Ji ber ku em Kurd êdî bi çarenûsa hebûna xwe dizanin û formula hebûnê di destê me de heye: Têkoşîneke hevpar. Têkoşîneke ku bi dengê doh, îro û sibê bang dike; têkoşîneke xurt, hestyar û zanyarî; xweşik, wêrek û zelal.
Di hejmara 320'an de PolîtîkART berê xwe dide vê têkoşînê: Têkoşîna ku ji zindanan û ji derveyî wan, bi hev re didome. Em di vê hejmarê de hem li ser muzîk, wêje û mîrateyên dîrokî yên Kurdistanê hûr dibin, hem jî li ser çarenûsa hebûna çandî û bîreweriya neteweyî. Nivîskarên ku di têkoşîna azadiya Kurdistanê de dîl hatine girtin jî li ser vê meseleyê diafirînin kedkar û xemxurên çanda civaka Kurdistanê ne jî. Û em hêvî dikin ku ev hejmar bi qasî dilopeke avê be jî kartêkirinekê li vê deryaya kûr a xebatên Kurdistanê bike.



**Herausgeber:** *Medya Presse-und Werbeagentur GmbH* Hans-Böckler-Str. 16 63263 Neu-Isenburg **Geschäftsführer:** Ahmet Yücedağ **Ver. Redakteur:** Roger Turaut politikart@yeniozgurpolitika.org

## Dagirkirin û Talankirina Berhemên Kurdistanê:

# Deriyê Mizgefta Mezin

Nezîrê BÎRDAR

Dagirkerên Kurdistanê bi tenê xwe li dagirkirinê ranegirtine, di heman demê de gewher, kanzayên sererdî û binerdî û hemû hunerên ji aliyê zanyarên Kurdan ve hatine dahênandin jî yan wêran kirine yan jî talan kirine. Dagirkeran an bi dek û lêban an jî bi darêzorê dest danîne ser berhemên wan, kirine malê xwe. Mînakeke şênber a vê talankirinê li Cizîra Botan rû daye. Rûdana vê bûyerê ku dibe cihê xemgîniyê wiha ye:

Wekî ku dîrok jî dide çespandin ku gelê Kurd gelekî dahêner û afirîner bûye. Gelek berhemên mîna nivîs, amûrên hilberînê û kedîkirina ajalan hwd. ji aliyê gelê Kurd ve hatine hilberandin û çêkirin. Îcar Cizîra Botan jî herêmek a erdnîgariya vî gelî ye. Gelek kesên navdar û dahêner ji vê herêmê derketine berhemên ku wan afirandine xistine bin xizmeta mirov û mirovahiyê.

Bo nimûne Deriyê Mizgefta Mezin a Cizîrê, ku ji hêla huner û nirxî ve li cîhanê wekî deriyekî dîrokî yê duyemîn hatiye çespandin, ku ev derî bi nîgar, dirûv, nimûş û nivîsên li ser hatine xemilandin di sala 1170yî de ji hêla danerê Kurd Îsmayîlê Cizîrî ve hatiye çêkirin yek ji wan berheman e. Ev derî bi bronzî hatiye rûkêşkirin û nivîsa li ser derî ji kanza tûncî ye. Rûyê derî jî bi nîgarên ji sifir û zîvî hatiye xemilandin.

Ev derî dubask e, di nîveka her du baskên deriyan de doqekên ji tûncî ku du marên ejderhay in, serê şêrekî û du teyrên baz ên ku asûna (pozisyon) hevdu temam dikin pêk hatiye. Li Cizîrê, ji van doqikan re "Ejderhayên Cizîrê" tê gotin. Îsmayîlê Cizîrî wêneyê van ejderhayan di rûpelê 225'mîn a pirtûka xwe de xêz kiriye. Lê mela Muhemed Yusûfê kurê Osmanê Eskîfî dema peça (kopya) vê pirtûkê nivîsiyî di pirtûka xwe de wêneyê heman ejderhayan xêz nekiriye. Bilindahiya vî derî 3 metre ye. Firehiya baskeke derî 1.13 e. Cizîrî ev derî di vedora zengiyan de çêkiriye. Dîroknasên hunerê dibêjin tu têkiliya hunera Artûkiyan bi vê hunerê nîn e.

Li ser deriyê Mizgefta Mezin a Cizîrê nivîsek ji aliyê Îsmayîlê Cizîrî ve bi zimanê Erebî ku ji kanza sifir û tûncî ye bi tîpên kûfeyî hatiye nivîsîn. Lê mixabin Deriyê Mizgefta Mezin ê ku rûyê wî bi sifirî, bi nîgarên mar û ejderhayî hatibû xemilandin, ji ber ku pîşta vî derî ji depî bû rizî ye, lê ev derî di sala 1946'an de ji nû ve ji aliyê xeratê Cizîrî yê bi navê Îsmayîlê Nûrî ve bi hunera xwe ya xeratiyê restore kiriye. Her wiha ev derî ji aliyê hin kesên Cizîrî ve ji nû ve hemû taybetmendiyên wî yên mîna nîgar, dirûv, ejderha, mar, doqik û nivîsên ku berê li ser hebûne dîsa li gorî reseniya wî hatiye nûjenkirin.

Di sala 1983'an de ji bo ku mîmartî û hunerên destan ên Selçûkiyan li Seraya Deriyê Topê ya Stenbolê di pêşangehê de bên nişandan, ku dê ev pêşangeh li Muzexaneya Şaristaniyê ya Anedolê ya Stenbolê bihata vekirin, her du baskên deriyê Mizgefta Mezin a Cizîrê jî li gorî nivîsa



Bronzener Türklopfer. Aus Mesopotamien. Berlin. Staatliche Museen



Talankirina erdnigariya Kurdistanê li aliyekê, em wek Kurd nikarin berhemên aîdî xwe jî bibînin, ne bi peretî ne bi belaşî. Yên ku ne ji te û ji çîna serdest, dikarin ji te rehettir xwe bigihînin berhemên li ber deriyê mala te.

fermî ya ku hejmara wê 395/143 e, ji Gerînendetiya Muzexaneya Mêrdînê tê xwestin. Miftîtiyê Cizîrê jî, roja 10.6.1982an ev derî ji bo demeke berdemkî ku li pêşangeha Stenbolê bê nişandan radestê Muzexaneya Stenbolê dike. Piştî ku pêşangeh qediya dîsa dê derî di sala 1984'an de radestê Miftîtiya Cizîrê bihata kirin. Lê ji ber ku Deriyê Mizgefta Mezin a Cizîrê li cîhanê xwedî nirxekî antîk û xwedî hunereke bêhempa bû, dagirkeran mîna her tiştên Kurdan ên din dest danîne ser derî, êdî ew venegerandine Cizîra ku cih û warê wî bû. Ew jî mîna berhemên kurdan ên din hiştine Muzexaneya Stenbolê bi vê lêba ixanetê dest danîne seriyê mizgevta qedîm.

Serokê Enstîtuya Enerjiya Nukleri ya Zanîngeha Teknîkê ya Stenbolê, Prof. Dr. Beril Tuğrul, xebateke dusalane li ser deriyê ku ji aliyê Îsmayîlê Cizîrî ve hatiye çêkirin dike û di encama vê xebata xwe de pirtûkekê dinivîse û girîngiya vî deriyê bêhempa hem li Tirkiyeyê hem jî li cîhanê belav dike.

Geştyarên Almanî yên ku têne Cizîra Botan, wêneyê Deriyê Mizgefta Mezin a Cizîrê dikişînin, ew jî li ber nimûşê van ejderhayan di teşeya wan de du ejderhayan çêdikin. Ev ejderhayên ji aliyê wan ve tên çêkirin li Muzexaneya Dewletê ya Almanî bi hejmara 1/2242an têne tomarkirin. Li gorî angaştekê, ev ejderha li ber berhema Îsmayîlê Cizîrî ya li Pirtûkxaneya Deriyê Topê hatine peçkirin (kopyakirin). Her wiha tê angaştkirin ku rûpela 26mîn a pirtûka Cizîrî ji vê pirtûkxaneyê hatiye dizîn. Her çi be bila bibe wan li nimûşê ejderhayên Cizîrî nêrîn, paşê ew ejderha li ber nimûşê wan hatine çêkirin, lê wan bi tu awayî nekarîne ejderhayên tam mîna yên Cizîrî çêbikin. Ejderhayên wan hem stûr, bêteşe û hem jî fîgurên wan jî tam ne mîna yên wî resen in. Lewre fîgurên ejderhayên Cîzîrî pir tenik û pir narîn in û rewatina wan bi hunereke hosteyane hatiye şayesandin.

Talankirina erdnigariya Kurdistanê li aliyekê, em wek Kurd nikarin berhemên aîdî xwe jî bibînin, ne bi peretî ne bi belaşî. Yên ku ne ji te û ji çîna serdest, dikarin ji te rehettir xwe bigihînin berhemên li ber deriyê mala te. Îro jî mînakên vê yekê gelek in li erdnigariya Kurdistanê. Gelek cihên ku bi hinceta ewlehiyê ji bo Kurdan têne qedekirin ji bo her cure talanê têne vekirin. Çi talana xwezayî çi jî talana behremendî, ferq nîne.

Dema Serokê Zanîngeha Prînceton û serokê Kursiya Mustefa Kemal, tirkologê navdar ê Emerîkî Bernard Lewîs ji serokkomarê Tirkiyeyê xelatê werdigire, ew 10.000 dolarî bexşê Muzexaneya Berheman a Stenbolê ya Tirk-Îslamê dike. Sedema bexşandinê ew bû ku wan Deriyê Mizgefta Mezin a Cizîrê di pêşangehê de nîşanî wan dabû. Bi rastî Melenî Carya keça Bernard Lewîsî, ku yek ji pisporên Zanîngeha Pensîlwanyayê bû, bibû evîndar û bengiyê Deriyê Mizgefta Mezin a Cizîrê. Bêguman ji bo pêşangeha Deriyê Mizgefta Mezin a Cizîrê pêwîstî bi gelek pereyan hebû. Bavê Meleniyê Bernard Lewîsî jî ji bo ku dilê keça xwe şad bike û dilê wê nemîne ev 10.000 dolar bexşandine.

# Nediyarî û piçek jî huner

Leyla UYANIK


*"Kesên ku ji dîtina xwe dikeve gumanê*
*Sivik digire tikayên te*
*Ger ku roj û heyv biketana gumanê*
*Wê hema, ji asîmanî winda bibûna*
*û biçûna"*

Nediyarî… Nediyarî yek ji rêgezên kuantûmê yên bingehîn e. Bi qasî ku gumanê dihewîne, ditirsîne ewqas jî meraq û lêgerînê çêdike, hêviyê dihewîne, kelecaniyekê tîne…

Di qada kuantûmê de, jiholêrakirina nediyariyê ango îhtîmala avakirina hebûnê, bi mîqdarê enerjiya tê dayîn ve girêdayî ye. Ji nediyariyên 'bin-atomî' bigire, heya yê tevahiya gerdûnê, aşkerekirina van, bi hêza libitandinê ve girêdayî ye. Di nav van îhtîmalan de ango di nav van nediyariyan de, wek mirov-dinya û gerdûnê, jiyana me bi rastî jî tiştek gelek balkêş e. Gerdûnê çima ev diyarbûn, nîşanî me da? An jî me bi xwe -bi enerjiya xwe- ev diyarbûn ava kir?

Ev hinekî jî dişibe jidayikbûna me, ku di nav milyonan hêk û avikan de em gihiyane. Li ser îhtîmala jiyana dinyaya me, lêkolîner Carl Sagan nirxandineke cuda dike, dibêje:"Divê em wilo şîrove nekin ku, ka gelo gerdûn alîgirê me ye, an li dijî me ye? Ew li dijî me bêxem dimîne ewqas." Ji vê cudatir vê Einstein jî dibêje:"Xweda bi gerdûnê re leyistoka zaran naleyize, her tişt girêdayî hev e û her tiştî wateyeke xwe heye." Bi vê re Einstein, nediyariyê red nake, lê bêhtir li ser îhtîmala girêdana wê ya bi zanistê re disekine.

Bi rastî jî kuantûmê, serê xwe gelek bi vê rêgezê re êşandiye. Li aliyê din, li gerdûna ku bi qasî serê derziyê zanîna me di nav de yan heye yan jî nîne, ev rêgez hinekî jî serê mirov tevlihev dike. Mezinên me belasebep negotine ku "heya xirab nebe, ava nabe." Lewma em hinek serê xwe tevlihev bikin, wê zirara xwe nebe. Ango tevliheviya serî nîmetek e û şopên zekayê dihewîne, meraq jî pîroziyek e. A rast meşa me ya mirovan, zêdetirîn li ser keşifkirina nediyariyan herikiye. Li gerdûnê ev sirra alemê qet û qet xilas nabe. Mirovan her ku hin tişt dîtine-eşkere kirine; vê carê berê xwe dane nediyariyên nû. Ango wek xelqeyan ku heya tu yekî venekî ya din li pey nayê. Di vê mijarê de, mirovan gelek şaşîtî jî kirine, derew jî hewandine. Mînak heya ku mirovan pê zanîn ku dinya girover e, gelek jê di vê rê de dîn û har bûn û gelekan jê qira hev aniye. Lê vê jî têrê nekiriye, dinya li ser qiloçên gayî hejandine, li aliyê din



◗ Goethe dibêje, "Min mala xwe li ser tinebûnê ava kir, lewra hemû gerdûn ya min e." Nexwe em jî wek Zerdeşt, çiqilê dara xwe çendî ji me tê hilkişînin jor û bigihînin ronahîyan û tîrêjên wan berdin nava erdê û kokên xwe di kûrahiya tarîtiya nediyariyan de bigerînin.

wek hêk û mirîşk ji hev welidandine. Ango her nediyarî, piştî ku aşkere dibe jî teqeziyê nahewîne. Di kuantumê de wilo xuya dibe ku mirov ji bo tiştekê nikare bêje ku "sedî sed rastî ev e." Ev rêgez, ne gumana Descartes e ku ji xwe ew ji her tiştî guman dike. Vê rêgezê derveyî zanîna me, zanîna bi milyonan îhtîmalan hewandiye. Ji berhema 'Kozmos' ya Carl Sagan em dikarin mînakekê li ser vê bidin. Dibêje "Bêyî wextî têgeha kêliyê, bêyî kêliyê jî têgeha wextî nikare were fêmkirin. Ev tenê ji bo cismên asîmanî wilo nîne." Û jiyanê didomîne "ger ku di hundirê mezelê de hûn li hevalê xwe yê 3 metre dûrê xwe dinêrin, nexwe hûn hevalê xwe 'bi halê xwe yê a niha' nabînin. Hûn halê wî yê beriya hev-dema sed milyon saniyeyî dibînin. Ji ber ku ferqa di navbera dîmenê hevalê we yê aniha û kêliyek berê de ewqas biçûk e ku, nayê ferqkirin." Bi vê mînakê, mirov dibêje gelo raste rast, an jî tam di kêliyê de em ê bikarin wext û kêliyê zeft bikin? Bi zanîna me ya niha zehmet e, lê baweriyên tesewifî ev zeftkirin bi perperîka çaremîn dîtine. Li aliyê din di kuantumê de, nediyariyên ku qet nikarin werin temaşekirin-çavderîkirin hene. Ev atom û bin atomên ku di her çavderiyê de xwe diguherin, ne pêkan e ku kêliyekê tenê jî bên kontrolkirin. Baş e, ka em berê xwe bidin aliyekî din û em bihêlin kuantûm bila bi pişika Schrödinger, li pey nediyariyan bikeve.

Goethe dibêje, "Min mala xwe li ser tinebûnê ava kir, lewra hemû gerdûn ya min e." Nexwe em jî wek Zerdeşt, çiqilê dara xwe çendî ji me tê hilkişînin jor û bigihînin ronahiyan û tîrêjên wan berdin nava erdê û kokên xwe di kûrahiya tarîtiya nediyariyan de bigerînin.

Dîtinên me bi çavan re sînordar in. Yên ku ligel mêjî dê zanîna me kamil bikin pêjnên me ne. Di roj û ronahiyê de dîtina me ya bi çavan pêşenga me ye; di şev û tarîtiyê de ango di nediyariyan de, ya ku me bi rê ve dibe pêjnên me ne. Di ronahiyê de dîtinên me, ango têgihiştina me ya bi çavan tenê dike ku em her tiştî bi halê heyî bipejirînin û li gor wan xwe bi rêk û pêk bikin. Lê di tarîtiyê de, dîtin encax bi kûrahiya pejnê çêdibe, lewma lêgerîna zanînê xurt e. Ronahî natirsîne, lewma meşa ligel wê, dîtina wêdetira wê êdî bi xwesteka kesan ve girêdayî ye. Lê tarîtî ditirsîne, lewma yan kesan li quncikê xwe asê dike yan jî dixe herikî-

neke bêserûber. Lê herdu jî, ronahî û tarî, di nav xwe de beşek ji heqîqetê pênase dikin. Ev heqîqet dişibe cismekê û siya wan dişibe mirovan.

Nivîskarek, di berhemeke xwe de ji ser Şêx Saîd, pênaseya 'sî'yê gelek xweş bi lêv dike. Dema Şêx Saîd, bi doza xwe re xurt dibe û nav û deng dide, siya wî ji cisma wî mezintir û biheybettir dibe û bi ser keskî ve diçe. Dema ku Şêx Saîd têk diçe, rengê siya wî ber bi zerbûnê ve diçe. Û kengî sêdar wekî aqûbeta wî li pêşiya Şêx Saîd xuya dike, wê demê siya Şêx Saîd, berî wî winda dibe, dimire. Sî, dem û temenê cismanî bi xwe re dirêj û kin dike. Lê ji bo sî hebe divê ronahî, ji bo ronahî jî roniya xwe biparêze divê siya xwe hebe. Wênesaz jî, di wêneyên xwe de herî zêde li pey siya cisman dikevin. Sî, kûrahiyê dide, wêneyê zindî dike û dixe tevgerê. Ji xêzkirina cisman wêdetir, siyan xêz dike ku cisman temam bike. Di muzîkê de ya ku ji notayan melodiyeke xweş pêk tîne û notayan bi hev re girê dide siya wan a ahengî ye. Dîsa di wêjeyê de bi qasî karekter balkêş û bandorker in, wêjevan ewqas li pêy siya wan dikeve, bi kûrkirina siyê, karakterê xwe xurttir dike. Gelemperî dema ku ji hunermendan tê pirskirin ku, ka gelo sî çawa xebatên wan dewlemend dike, bersiv bi heman awayî dibe: "Ez na, lê huner bi xwe dicebirin…" Ango nediyarî, da ku xwe bîne ziman, hunermendan li pêy xwe dibezîne, bi siyê xwe dîtbar dike û cardin vedigere behra xwe.

### Nediyarî malzaroka dinyayeke baştir

Wallerstein, ji bo nediyariyan dibêje :"… Encama min jê derxist ew e ku nediyarî tişteke newaze ye û teqezbûn ger rast bûya, wê ji bo me di warê exlaqî de mirin bûya. Ger derheqê siberojê de em xwediyê agahiyên teqez bûna, wê demê ji bo kirina hin tiştan ji hêla exlaqî ve dê zorlêdan tinebûya. Ji ber ku hemû kiryar dê di nav teqeziya tayînkirî de cih bigirin, em ê bibûna bendeyê hemû îhtîrasan û me dê ji bo berjewendiyên xwe her tişt bi serbestî bikira. Ger her tişt nediyar be, hingê siberoj ji bo afirineriyê, ne tenê ji bo afirineriya mirovan ji bo afirineriya xwezayê hemûyî wê vekirî be. Lewma ew ê li îhtîmalan ango li dinyayeke baştir vekirî be."

Wallerstein bo felsefeya nediyariyê bingeheke xurt datîne. Li aliyê din, em vê daxwaza bidestxitina rêgeza nediyariyan di hemû cureyên lêgerînê de dibînin. Mîna razên ku her dem li benda keşfkirinê bin, mîna keşfa ku dermanê nemiriyê (ango heqîqetê) dibîne û wê ji destê xwe nerevîn, lê digere. Johannes Keplerê ku wekî kaşifekî di astronomiyê de gera xwe kiriye, bi hiş û hîsên xwe wiha bangî nediyariyê kiriye: "Kesên ku dengê vê senfoniyê dibihîzin, hema kêliyek be jî wê bikarin ji bêdawîbûna demê serwext bin û hema kêmek be jî wê bikarin zewqa Xweda, ew Xwedayê ku hunermendê herî mezin e, tahm bikin… Ez xwe berdidim ber bextê avgera coşa pîroz… Min qalibê wê danî û pirtûkê ez dinivîsim. Ev pirtûk, dixwazî bila niha were xwendin, dixwazî bila di sedsala pêşiya me de were xwendin, qet ferq nake. Mîna Xwedayê ku ji bo peydakirina şahîdekê 6 hezar sal li bendê maye…" Tê gotin ku zeftkirina demê hêzeke xwedayî dixwaze. Ango dem yek ji nediyariyên mirovan a herî mezin û bingehîn e. Lewra zanîna demê, tê wateya nebûna mirinê ango têgihiştina tinebûna mirinê…

Tesewif jî, di dem û nediyariyan de şaxên xwe berdide kûrahiyan. Yek ji mînaka vê ya gelek tê zanîn heye. Dibêje: "Cuang Tzu demekê di xewna xwe de dibîne ku bûye perperikek. Lê dema hişyar dibe nizane ka wî xeyal kiriye ku bibe perperikek an perperikek bû ku dixwest bibe mirov." Belê xewn an jî xeyal, bin-hiş an jî ser-hiş, pêşdîtin an jî kexanet, keşfkirin an jî bibîranîn. Ev hemû malavanên okyanûsa nediyariyê ne. Mîna kuna reş ku her tiştî bêeman dikişîne nava xwe, di nediyariyan de tiştan safî dike û nîşanî kuna spî dike. Mîna tarîtiya ku, reşahiya xwe ji kombûna hemû rengan pêk tîne, çiqas dewlemendiya rengan hebe, ewqas qemeriya reşahiyê jî dibe. Mîna agirê ku sembola xwedawendiyê ye ku her tişta ku pê re dikeve temasê dişibîne xwe. Çerxa nediyariyê jî ji kombûna her tiştî ava dibe, xwe dizivirîne û ji bo dîtbariyê li qewlê xwe digere.




Obscure but Sincere, Paige Williams

> Dibêjin tenê dema ku tu li tembûrê bidî wê demê dikarî gotin û sirrê bi hevdû re biqefêlî…

Nediyarî, di huneran de jî gera xwe didomîne. 'Da Vînci' bi 'Mona Lisa'yê re diyarî û nediyariyê mehr dike û wek xelat diyarî dîrokê dike. Mozart, di tenêtiyên xwe yên nediyar de têkûziya behremendiya xwe li dar dixe. Nietzsche jî ji bo nediyariyên mirovahiyê li mirovê diyar-tekûz digere. Wêjekar ji bo nediyariyên dil û hişê xwe nifteya dîrok-kes û civakê digere. Di baweriya Ehlê Heq de tê gotin ku di tembûrê de kerameta Xweda heye. Tê gotin dema xweda mirov çêkirine, surr jî li wan bar kiriye. Lê belê ji ber ku mirov, li ser sonda xwe nesekinîne, ew surr ji mirovan hatiye girtin û pifî li têlên tenbûrê hatiye kirin. Her wiha dibêjin tenê dema ku tu li tenbûrê bidî wê demê dikarî gotin û surrê bi hevdû re biqefêlî… Ango nediyarî di hunerê de; di wêje, wêne û muzîkê de diyarbûna xwe dide dest. Ger hebûn rastiyek be, jiyan jî dibe hunerek. Her huner ji bo harîqayên xwe biqefêle, dikeve nav tûrikê xwe yê nediyariyan. Di nediyariyan de gerandina parî û perçeyên xwe, bi qasî hêvîgeriyê ewqas jî wêrektiyê dixwaze. Hikmê nediyariyê biçûk nîne, ger tu nekarî wê ji nav tarîtiya wê derxî, dê ew te bikişîne nav xwe. Heya ku li hember windakirinê wêrekî neyê nîşandan; mirov dê nekare deryayên nû kifş bike. Ma gengaz e ku mirov dema tîr û kevana xwe biemilîne, her tim li hedefê bide. Dema av derbas dibe jî, ne av heman av e, ne jî kesê ku ji avê derbas dibe heman kes e. A muhîm ji teqezbûnê zêdetir xwegihandina têkûzbûnê ye û hunermend jî herî zêde li pêy vê ye. Ji bo têkûzbûnê jî, ya ku li pêş huûnermend e, xebatekî bê ser û ber, kedekî mezin e. Dema ku hunerzan bi vê kedê radibe ango dema ji fikra hedefdayinê derdikeve, wê demê ew bi xwe him dibe tîr him dibe kevan him jî dibe hedef bixwe. Wek ku Îbn-î Arabî gotiye;

*"ji gerdûna tê dîtin wirdetir kûr ve dakeve çavê min*
*Ger ez xwedayek bim ku difikirim*
*Wê demê Xweda bi min re difikire."*

Ango sirra nediyariyan bi saya hunera me diyarbûna xwe temam dike.



Flammarion

# Zarokekî dinale: Fêrîkê Ûsiv

**D**Hunera Fêrîkê Ûsiv ji hestên kûr û xeyalbexşiyekê dizê. Helbesta wî jî wek ruhê wî romantîk û pastoral e, bi keser û xemgîn e, geh wek çemekî digujguje, geh wek perperikekî difire, geh wek peleke payîzê ji dara xwe diweşe û geh jî wek qêrîneke zarokekî ji bo welatê xwe dinale.


◆ Esra AKSOY

*"Cahilîya min bû xezaleke kûvî,*
*Min zeft nekir bazda ji destê min revî,*
*Û şev û ro çiqa li pey direvim,*
*Nagihîjmê… aqa jê dûr dikevim."*

Sal derbas bibin, sedsal serbas bibin, qewm didin dû qewman, nifş li dû hev rêz bibin û guhertin bibe gerînekek li ser serê însanan bigere û her tişt biguhere jî tiştek tenê her tim yekane ye, ew jî hestên mirovî ne ku bi hezar salan ji wan hunerên cûr bi cûr zîl dane. Lê guman tune ye ku hunera herî qedîm û tim xwedî cih di ruhe mirov de helbest e. Ku ew halê hestên me ye; hestên me yên êdî bi hestî û çerm in.

Di vê nivîsê de ez ê behsa helbestvanekî wisa bikim ku ew te'bîrên ku li jor me vegotin, yek bi yek xwe di ruhê wî de top kirine û zîl dane derketine erş û ezmanan. Fêrîk! Fêrîkê Ûsiv… Xerîb e li xerîbiyê û helbestvanê xurbetê ye. Dengê deşt û çiya û evînê ye, qêrîna hesret û keserê, dengê neteweperweriyê ye ku çîk jê diçin…

Ferikê Ûsiv di sala 1934an li Yêrêvanê li gundê Pampê ji dayik bûye. Ew ji malbeteka esilzade bû. Bapîrê wî tevî bav û apên wî piştî şerê cîhanê yê yekemîn tevî Kurdên Êzîdî û Ermenîyan, ji ber zilm û zora Romê mecbûr mane ji welatê xwe Qersê ber bi Rûsyayê ve bar bikin û jiyana wan a mişextiyê bi vî şiklî dest pê kiriye. Di rê de gelek kes ji malbata wî mirine, heta li gor gotinekê metika wan jî ku bi wan re bû, piştî mêrê wê tê kuştin, di rê de hema bi yekî din re tê zewicandin û li rêya xwe dewam dikin. Gelek trajedî di wan rêyan de tên jiyîn ku ew trajedî her tim ji bo Kurdan di serdemên cuda de xwe dubare dikin. Yanî em bi rehetî dikarin bêjin ku Kurdên mecbûr man bibin penaber, di nava penaberiyê de jî penaberî dîtine û tim xezeba polîtîkayên dewletan serî li wan gerandine û felek li wan şaş kirine. Wan feqîrî, belengazî, birçîtî û neçarîyên gelekî mezin û giran dîtine. Lê li Rûsyayê piştî Şoreşa Oktabirê, wek gelek miletên penaber ji bo Kurdan jî atmosfereke nû peyde dibe. Em dikarin bêjin ji bo avakirina edebiyatekê, salên 1920an bûn destpêka guherinê. Xebatên perwerdehî û zimanî dest pê dikin. Xwendingehên Kurdan tên vekirin û ew nifş ewreka edebiyatê ava dikin. Em vê edebiyatê wek edebiyata sêwîyan jî pênase dikin, ji ber ew zarokên ku di van xwendingehan de tên perwerdekirin giş sêwî ne, malbatên wan yan di şer de yan jî li ser rêya mişextîyê dimirin an jî tên kuştin. Wek Eskerê Boyîk jî dibêje: "Bextê sêwiyan hebane, ji xwe sêwî nediman." Bavê Fêrîk, Ûsivê Îbo jî sêwî bû, bav û apên wî ji hêla Romîyan vê tevî sedan mêrên gund tên kuştin. Bavê Fêrîk û apê wî mecbûr dimînin diçin Gurcistane, lê piştre di sala 1922an vedigerin gund cem xizmên xwe. Fêrîk jî li gund çêdibe û zarokatiya wî li wir, di



nav xwezayeke bêhempa de derbas dibe.

Ew xwendina xwe ya pêşî li xwendingeha gund dibe serî, piştî xwendina çar salan ji bo xwendina bilind diçe Yêrîvanê û dest bi xwendina dîrok û fîlolojiyê dike. Ew pêşî ji xwendinê hez nake û dixwaze here gundê xwe û bibe şivan, xeyala wî şivantî ye. Lê piştre ji beşa xwe hez dike û dewam dike. Wan salan di Riya Teze de dest bi xebatê dike û gelek helbestên wî û nivîsên wî di vir de çap dibin. Piştî ku enstutîyê diqedîne li Radyoya Êrîvanê dest bi karê redaktoriya stranan dike û piştre jî wek serokê beşa edebiyatê dixebite. Her çiqasî rewşa wî ya aborî û karê wî baş jî be, di nav wê atmosfera bajêr de her tim xwe wek girtiyekî hîs dike û radibe vedigere gundê xwe Pampê. Li wir bîst û pênc salan mamostetiya zimanê Kurdî dike. Lê tu carî ew tekiliya wî ya bi edebiyatê re qut nabe, ber'eksê wê her ku diçe xurttir û qewîntir dibe, ji ber ku ew tenê li gundê xwe bextewar e.

Li Rûsyayê piştî Şoreşa Oktabirê, wek gelek miletên penaber ji bo Kurdan jî atmosfereke nû peyde dibe. Em dikarin bêjin ji bo avakirina edebiyatekê, salên 1920an bûn destpêka guherinê. Xebatên perwerdehî û zimanî dest pê dikin. Xwendingehên Kurdan tên vekirin û ew nifş ewreka edebiyatê ava dikin. Em vê edebiyatê wek edebiyata sêwîyan jî pênase dikin

Di sala 1961ê de berhevoka wî ya bi navê Çavkanî çap dibe ku ev pirtûk têsîreke gelekî mezin li xwîneran dike. Heta bi qasî ku Eskerê Boyîk dibêje, ew gelekî binavûdeng dibe û hemû çapên pirtûkê diqedin. Gelek xwîner helbestên wî jiber dikin û pir ji helbesta wî hez dikin. Piştî Çavkanîyê , berhevokên wî yên bi navê Gûla Elegazê(1964), Lîrîka(1967), Ûsivê Nevya (1973), Narê (1977), Hisretdefter (1984) û Dinya Delal (1987) çap dibin. Ew wergêrekî pir baş bû, ji kesên wek Pûşkîn, Goethe, Shakespeare, Lermontov wegerên gelekî hêja kirine. Di heman demê de wî pîyes û destan jî nivîsîne. Lê heger em pênaseya nasnameyekî bikin bêguman nasnameya wî helbestên wî ne.

Hunera Fêrîkê Ûsiv ji hestên kûr û xeyalbexşiyekê dizê. Helbesta wî jî wek ruhê wî romantîk û pastoral e, bi keser û xemgîn e, geh wek çemekî digujguje, geh wek perperikekî difire, geh wek peleke payîzê ji dara xwe diweşe û geh jî wek qêrîneke zarokekî ji bo welatê xwe dinale. Ew rengên gund, hesret, keser û evîniyê dibin dengê helbesta wî. Jiyana gundewarî, di helbestên wî de bi realîstî û wek dîmeneka zindî hema bêje di hemû berhevokên wî de xwe nîşanî me dide. Ew evîndarê jiyana gund û xwezayê ye. Di helbestên wî de hesreta zaroktiya wî, xwezaya ku tê de mezin bûye, bi vegotina wî ya lîrîk û pastoral wek şaxên darekî ruhê xwendekar jî dipêçe. Bo mînak helbesta wî ya bi navê "Pampa Min" dibe dengê ruhê wî û wek stranekî ji pênûsa wî diherike.

Esas çavkaniya helbestên Fêrîkê Ûsiv li gor min pêşî tebî'eta wî ye, paşê jî ambîyansa dîmenên zarokatî û gundê wî ye. Wî di helbestên xwe de îmajên wek evîn, xweza, xerîbî û hesret, tenêtî û extîyarî, derengmayîn, neteweperwerî, mirin, zordestî û azadiyê bi kar anîne.

Ew helbestvanekî pir romantîk û dilzîz e, hema hema ji her tiştî re helbestek nivîsiye, lê di helbestên wî de mijareke din ya eşkere heye ku ew jî evîn e. Fêrîkê ku dilê wî her dem ji ber evîna jinan dişewite, carna bi coş e, carna jî ji ber bêbersiviya hestên xwe hêvîşikestî ye. Gelek caran ji bo kesek bi yara wî nehese navê wê eşkera nake, carna jî navê wê diqîre.

"Ez navê te nadim, ezîzê,  
Vedişêrim wek xezîneyê, defîneyê,  
Wekî kes neynê rêç û îzê,  
Nedizê xezîneya evînê.

Min hez kir ji Donayê, Rayîsê,  
Muhbeta Gulnazê başqe ye,  
Begem kir qiseta her qîzê,  
Sowbeta Gulnazê başqe ye."

Wî rewşa Sovyetê her tim rexne kiriye û em dikarin bêjin ku ew yekem kes e ku rewş qebûl nekirîye. Xwedî hesteke xurt a netewerperweriyê ye. Di helbestên Fêrîkê Ûsiv de jî ev atmosfer cîyê xwe digre û rengekî xweş û geş dide dengê



Pampa Kurdan

> Zimanê helbestên Fêrîkê Ûsif zelal û herikbar e. Ew helbestvanê gel e. Her kes dikare ji helbestên wî fêm bike û xwe tê de bibîne. Zembîla wî ya peyvan dewlemend e û peyvên Tirkî, Rûsî û Ermenkî di helbestên wî de hene û îro ji bo zimanê Kurdî bûne gencîne.

…Pampa min a baş,  
Pampa min a kubar  
Wê pal vedaye wan quntarê sar,  
Pamp mîna bûka, bûka xeml lê bend,  
Dorê çiyayêd me girtine govend.  
Çiyayêd me bilind, çiyayêd me kubar  
Jê dixulxulin cew û kaniyê sar,  
Şimalê mij tê mîna karwana  
Ser çiyayê me ra diçe arana.

wî. Lê dengê wî tim bi keser e, ji ber ku ew ji axa xwe ji welatê xwe dûr e û ji dûritiya welat gazinan dike.

"Qurn û dewir û sal-zeman  
Heyrî bengzê te ez mam,  
Kurdim, kuyî Kurdistan,  
Wey dîl û bindesta min…"  
" Kurd xerîbdoste,  
Kurd ji mileta aqa hiz kirye,  
Wekî navê wan  
Bi hewas-heyran  
Ser zar û dilê kurdada dijîn,  
Gotye înglîs,  
Romo û Receb,  
Kurê xwe ezîz  
Navkirye Ecem,  
Navkirye Ereb,  
ûris û Gêrman.  
û hela çerkez,  
Cahûd, Emîran..  
Kurd xerîbdoste,  
Her milet û merd  
Ser zar û dilê kurdada dijîn,  
Lê hene nemerd,  
Ku naxwezin kurd  
Erda jî bijîn…"

Fêrîkê Ûsiv xwedî poetîkayeke berz e. Ew ji sala 1955an heta dawiya emrê xwe, tim rêhevalê pênûsa xwe bû. Tebî'etê wî û serkeftina wî ya di wergeran de tesîr û feydeyeke mezin lê dike. Ew mijar û îmajên ku me li jor qal kirin di poetîkaya wî de cîyê xwe digirin. Ruhekî wî yê sosyalîst jî heye di helbesteka xwe de behsa Tayvanê dike. Wek hemû romantîkan wî jî her dem behsa xwe dikir û xwe cuda didît. Ji heslbestên wî hesret û nostaljî kêm nabe. Ji cureyên klasîk dûr neketiye lê rengê xwe jî dane helbestên xwe. Wî ji bo gelek kesan helbest nivîsîne û diyariyî wan kirine. Heya wî ji helbestvanên klasîk heye û hinek helbestên wî di derheqê helbestvanên klasîk de ne.

" Qernek bêtxûb hat yek kibîr kir,  
Sihabê kilama te ji bîr kir  
Carek ca dawşîne tûrê bîrê:  
Dîharbe dewrêşê wê Cizîrê,  
Feqî bê baxê te wek çem û ab,  
Xanî li te bibe konê zerbab,  
Culetke, vehilde tu tev û mer,  
Bi av can bike sosinêd ter,  
Zanibe, ewin xwe te Mem û Zîn."

Zimanê helbestên Fêrîkê Ûsif zelal û herikbar e. Ew helbestvanê gel e. Her kes dikare ji helbestên wî fêm bike û xwe tê de bibîne. Zembîla wî ya peyvan dewlemend e û peyvên Tirkî, Rûsî û Ermenkî di helbestên wî de hene û îro ji bo zimanê Kurdî bûne gencîne. Hêla wî ya folklorîk jî xurt e ji ber ku ew li odeyan mezin bûye; û ji ber vê yekê jî destannûsekî hoste ye. Zimanê helbestên wî muzîkal e, gelek helbestên wî hema wek stranekî diherikin û jixwe bûne stran jî. Wî hunera bêjeyî, metafor û îmaj pir bi serkeftî di helbesta xwe de bi cî kirine û ew xwedî zimanekî fîgûratîf û mîzahî ye.

Fêrîk, Pûşkîn wek hosteyekî qebûl kiriye û di sala 1987an de ji bo bajarê ku Pûşkîn lê maye bibîne derdikeve gereke demdirêj û li gelek bajaran digere. Di sala 1997an de vedigere Yêrîvanê û bi nexweşiyeke pir giran dikevê û 3yê Gulana 1997an de stêrka wî dicilmise û koça xwe ya dawî dike. Mişextî û penaberiya wî ya vê cîhanê jî temam dibe.

*"Ez ku mirim, hûn meytê min çehl kin li pêşa çiya,  
Bila bibin kumeytê min tûmên ket û kuncîyan."*

*"Bên li ser mexberê min beçêrin berx û kar,  
Berxvan bibêjin ezberên min heyran û hijmekar."*

# Stran, wek xebatên bîrê

◆ Mahmut DEMIR

*"Ev mêjû*
*Wê têkoşînê*
*Bidomîne helbet"*

Rojen Barnas

Di dîrokê de desthilatdaran her tim hebûna bindestan înkar kir, nasnameya wan qebûl nekir û ji bo wan dîrokeke sexte afirand. Yên ku vê dîroka sexte qebûl nakin û hebûna xwe diparêzin jî rastî zilm û zordariyê hatin û tên. Zilma serdestan li her qada jiyanê bi rûyên cûr bi cûr derdikeve pêşiya me, lê divê neyê jibîrkirin ku li dijî vê zilmê têkoşîn jî mezin dibe. Huner jî yek ji wan qadên têkoşînê ye. Hunermend bi berhemên xwe de vê dîroka sexte înkar dike û rastiya xwe nîşan dide. Em dikarin gelek mînakên ji şano, wêje û sînemayê jî bidin lê di vê nivîsê de ez ê guh bidim stranên ku wekî xebata bîrê hatine çêkirin, bi salan in kevn nabin û her car ji nû ve bûyer û lehengên demekê bi bîra me dixin.

Di serî de ez ê berê xwe bidim salên nodî û Navenda Çanda Mezapotamyayê (NÇM). Wekî min gotî, zilm her tim bi rûyên cuda derdikeve pêşiya me. Di salên nodî de jî zilm li gund û bajaran mezin dibû, nûçeyên kuştinên kujernediyar, şewitandina gundan dihatin bihîstin. Lê helbet gel jî bi îrade û baweriya xwe bi rihê serhildanan li ber xwe dida. NÇM di atmosfereke wisa de di sala 1991an de li Stenbolê hate damezrandin.

Hunermendên NÇM'yê bi awayekî kolektîf û armanceke hevpar li ser beşên cuda yên hunerê dest bi xebatan kirin. Gelek komên muzîkê jî li NÇM'yê stranên xwe çêkirin û gelek ji wan hê jî wekî roja ewil di guhê me de ne. Ji wan stranan yên ku herî zêde li ser min bandor dikin jî ew stran in ku hunermendan ji bo bîranîna rêhevalên xwe çêkirine. Ez wan stranan wekî destanên nûjen dibînim û dixwazim çend ji wan bi we re parve bikim.

Dema min dest bi nivîsandinê kiribû, min xwest dengê muzikê jî hebe. Min lîsteya xwe vekîr û dibe ku bi bandora mijara vê nivîsê destê min çû Şitla Azadî ya Koma Çiya. Şitla Azadî ya ku ji bo bîranîna çaran û Zekiye Alkan hatibû nivîsandin, bi dengê Alî Temel bi salan in can dide çîroka wan lehengan. Zekiye, Mahmut, Eşref, Necmî û Ferhat li dijî îxanet û teslîmiyetê agir bi bedena xwe xistibûn. Zekiye li ser Sûrên Amedê, çaran jî li Zindana Amedê… Bêguman îradeya wan hêjayî destanan e,  Alî Temel jî rêhevalên xwe ji bîr nekirin, xwest neyên jibîrkirin û bi saya Şitla Azadî, wekî min gelek zarokên kurd nav û çîrokên wan lehengan bihîstin.  Herwiha dema dengê wî dibihîzim, Alî Temel jî bi bîr tînim. Wî kedeke mezin dabû saziyên çandî û piştî gelek xebatên din bi saz û qelema xwe berê xwe dabû çiyayên Kurdistanê.

Koma Amed jî yek ji wan komên wê demê ye ku di sala 1988an de li Enqereyê ji aliyê xwendekarên tibê ve hatiye damezrandin û piştî damezirandina NÇM'yê tevlî wê bû û bi sê albûmên xwe di nav klasîkên muzika Kurdî de cih girt. Gelek hunermend di Koma Amedê de xebitîn û Evdilmelik Şêxbekir jî yek ji wan bû. Wekî Alî Temel, Evdilmelik jî hunermend û şoreşgerek bû û ew jî piştî xebatên xwe yên çandî û hunerî tevlî refên gerîla bû.

Dema cara ewil çûbûm avahiya NÇM'yê wêneyê Saryayê bala min kişandibû. Min ew wêne gelek caran dîtibû lê dîtina wê carê bandorek mezin li min kiribû, ji ber ku ew der mala hunera Saryayê bû. Sarya yek ji hunermendên NÇM'yê bû û hunermendeke piralî bû ku li ser şano, folklor û helbestê xebatên wê hebûn û pişt re wekî gelek rêhevalên xwe berê xwe dabû çiyayên Kurdistanê.

Em dengê wî di albûma yekemîn a Koma Amedê ya bi navê Kulîlka Azadî de dibihîzin. Hemû stranên vê albûmê bêhempa ne lê yek ji wan bi mijara me eleqader e, ew jî "Destana Sîlopî" ye. Li ser besteya Fîkrî Kutlay, Evdilmelik ji bo bîranîna kesên li Sîlopiyê hatin qetilkirin gotinên vê stranê dinivîse û dibêje "Na, na Silopiyê ji bîr nakim, ez ji bîr nakim ey heval." Ez jî dema guh bidim vê stranê him gelê Silopiyê him jî Evdilmelik bi bîr tînim.

Koma Amedê albûma duyemîn bi navê "Agir û Mirov" jî bi tarzên cuda û stranên hêja li muzîka Kurdî zêde kir. Li gel stranên gelêrî wekî Helîm Can, stranên wekî Jiyanek Nû û Can Feda jî kelecaneke mezin didin mirov. Dîsa di vê albûmê de jî em dikarin mînakekê bo mijara me bidin. Strana Ronahî Bêrîvan ji bo bîranina du keçên Kurd ên têkoşer ên ku li bajarê Mannheimê agir bi bedena xwe xistibûn hatiye nivîsandin. Min cara ewil di vê stranê de navê wan bihîstibû û çîroka wan meraq kiribû. Dema lê guhdar dikim, sankî cara ewil dibîhizim, ji nû ve çîroka wan hîn dibim.

*"Yek caran agir dibe ronahî*
*Yek caran ronahî dibe agir*
*…*
*Mezin dibe, dibe derdekî giran*
*Dişewite, diqîre, dibe Bêrîvan"*

Dema cara ewil çûbûm avahiya NÇM'yê wêneyê Saryayê bala min kişandibû. Min ew wêne gelek caran dîtibû lê dîtina wê carê bandorek mezin li min kiribû, ji ber ku ew der mala hunera Saryayê bû. Sarya yek ji hunermendên NÇMyê bû û hunermendeke piralî bû ku li ser şano, folklor û helbestê xebatên wê hebûn û pişt re wekî gelek rêhevalên xwe berê xwe dabû çiyayên Kurdistanê.

**Strana Agirê jiyan**

Min ew cara ewil bi strana Agirê Jiyan "Sarya" nas kiribû û pişt re çîroka wê xwendibû. Wek min ji bo stranên din got, strana "Sarya" jî her tim hestekê xurt dide min. Dema lê guhdar dikim eynî wêneyê wê tê ber çavên min û têkoşîna wê difikirim. Dîsa strana Agirê Jiyan "Rehşan" jî yek ji wan



stranan e ku wek xebata bîrê hatiye çêkirin. Çîroka Rehşanê jî wekî çîrokên Zekiye, çaran, Ronahî û Bêrivan hêjayî destanan e, îrade û baweriyeke mezin nîşanî me dide. Strana "Rehşan"ê jî bi salan e çîroka wê ji me re dibêje: "Em te ji bîr nakin delalê, tu car tu wextan"

Ji ber ku ji zarokatiya xwe ve ez li wan guhdar dikim û hê jî di guhên min de ne, mînakên min ji wan deman bûn lê helbet stranên bi vî awayî ne tenê di salên nodî de hatin çêkirin. Zilm jî, têkoşîn jî hê jî didome. Em dikarin ji salên dawî jî mînakên wekî "Rûbarê Min" a Mizgin Tahîr û "Li Herî Jorê" a Hunergeha Welat bidin. Ez hemû xebatên bi vî awayî wekî xebatên bîrê dibînim û rola wan a li ser bîra nifşên dahatûyê gelekî girîng dibînim. Herwiha em bi saya xebatên wisa, hêz û girîngiya hunerê jî dibînin.

Bi riya vê nivîsê hemû hunermendên ku di riya têkoşînê de can dane bi rêzdarî bi bîr tînim.

*"niştimanê, dayîka me gişan!*
*kurên te yên qemer gîtar û kilêş gihandin hev*
*nalîna kilêşê radiweste*
*ew gîtar e distrê her*
*êvaran*
*di hundirê her kesî de Evdilmelek*
*distrê di dilqê gêrîlayekî zana de*
*baran dibare bi hundirê me de*
*dilê me dikevê*
*em çi qas mirî bin, ew qas bedew in"*

Kawa Nemir

**Çavkanî**

*Zêmara Derengmayî, Havîn Funda Saç, https://www.youtube.com/watch?v=j0n0ZLM9et8&t=1840s*

*Sarya'nın şiiri Sarya'nın dansı, Gülcan Dereli, https://www.ozgurpolitika.com/haberi-saryanin-siiri-saryanin-dansi-168169/*

*Bir Şarkıya Manifesto Sığdırdı, İsmet Kayhan, https://www.ozgurpolitika.com/haberi-bir-sarkiya-manifesto-sigdirdi-111746*

# Ez ê çawa li nivîsê vegerim?

Bêrîvan SARUHAN

*"Ez edebiyatê nakim, ez pirtûkekê ava dikim. Hûn fahm dikin? Hûn fahm nakin? Ez mîna ku fahm dikim tevdigerim. Evînê ava dikim, karên metbexê yên ku tên ferzkirin dikim, mîna ku tê ferzkirin pirtûkan dinivîsim, mîna ku tê ferzkirin wesayet diajom. Ez bi temamî aîdî we me. Lê hûn?"*

Margurate Duras

Gelek jin dixwazin di nav edebiyatê de ji xwe re cihekî bigirin, binivîsin û êdî dixwazin vê yekê bi kalîtetir û bi sozdarî bikin. Pirsgirêk mijar û nivîsandin e gelo? An qadên ku ji ber tehekûma hezar salan li me hatine tengkirin? Baş e hîskirina şewqa feraseta mêrane ya li ser hemû pratîkên weşanxaneyan, pirtûkên ku tên nivîsîn û wergerandin li ku dimîne? Kêmbûna jixwebaweriyê? Tirs? Di nav van hemû hewldanên jiyanê de nedîtina xwe, ji ber nebûna demî ye gelo? Helbet para van hemû tiştan di vê mijarê de heye.

Jina ciwan meraq dike ka dê nivîsên wê çawa bin û wê yekê qet nafikire ka dê bertekên baş çêbin an xerab, ya ku ew lê digere zêdetirî vî tiştî ye. Ew bi xwe nikare biryara vê yekê bide. Heke karîba dê pirs ne ji yekî/a din ji xwe bipirsiya. Lê berî her tiştî divê mirov xwediyê hêza xwe-rexnekirinê be. Divê bersiva pirsa "ez ê çi binivîsim"ê bide. Bersiva vê pirsê "her tişt e". Tu çi dixwazî binivîse. Hem jî bêyî hîskirina mecbûriyeta tiştên girîng, bêhempa an jî dê neyên xwendin. Heta tiştên herî ji rêzê binivîse ku di nav wan têgehên ku tu girîng nabînî bila nirxên edebiyata xwerû xwe bibînê. Bila bê fahmkirin ka tiştên ji rêzê ji bo jiyanên me çiqas giring in.

Weke jineke hatiye dawiya salên xwe yên 20î, li metropolê dijî û mîna ku xwe di nav fîlmekî zanistî de hîs dike û dizanim bê nivîs dê şifayê bide min, ez dikarim bibêjim ku li gor şeş sal berê kêmtir dixwînim û van sê salên dawî  de hema beje qet nanivîsim. Di nav pirtûkên ku tên nivîsîn û çapkirin de mirov sermest û gêj dibe. Mirov nizane bê destê xwe bavêje çi û çi bixwîne. Dema ku wisa dibêjim jî derdikevim rêwitiyeke panaromîk. Min cara yekem kengî dest bi nivîsê kiribû. Ji nav van du zimanên ku ez herî baş dizanim nivîsîna kîjanê ji min re rehet tê? Bêhemdê xwe ez çerxa demê bi paş ve dibim û rêwitiyekê dikim.

Sal 2002; xwendekara dibistana seretayî û di sinifa duyem de me. Tirkiya ku bi kotekî hînî me dikirin êdî baş dizanim, di pêşbirkên xwendinan de dibûm yekem û ji teref mamosteyên xwe yên


Magic Flight, Remedios Varo

îdealîst, hêjayî xelatan dihatim dîtin. Lênûska xwe ya bîranînan ya şîn ku li ser wêneyên kulîlkan hebû min dida hevalên xwe û min dixwest ku derheqê min de fikar û hestên xwe binivîsin. Sal 2003; min helbestên Tirkî yên ku ji du sê çarînan pêk dihatin dinivîsîn, li hêviya bavê xwe dimam ku li daktîloyê bide û paşê min dişandin bo kovarên zarokan. Sal 2004; li malê ajandayeke sor dibînim û dest bi nivîsîna rojnivîskê dikim. Ev lênûska ku min tê de tenê rûtîna xwe dinivîsî ji ber îhtîmala ku dê bê xwendin di nava salê de avêt. Sal 2006; Azadiya Welat nas dikim, ez dixwazim wateyekê bidim wan herfan û bêjeyên Kurdî yên min qet nebihistine jiber bikim. Her roj piştî dibistanê diçim rojnameyê dikirim û dibim malê. Beşeke bi navê ferhengok heye û bêjeyên li wir li lênûska xwe dinivîsim… Sal 2009; êdî lîse. Weke xwendekarek di xwezaya xwe de polîtîk, ji bo nivîsîna ceribandinên Tirkî û pir kêm be jî bo nivîsandina Kurdî hewl didim. Sal 2013; ji ber hişmendiya Kurdayetî û piçek jî ji ber meraqê diçim 'Ziman û Edebiyata Kurdî' dixwînim, êdî tenê dest bi nivîsîn û xwendina Kurdî dikim. Ji ber formasyona min a heyî û ji bo ku naverokên Kurdî zêde bibin vê yekê didomînim. Gelek caran gelek kes fahm nekin jî, bi zanîna vê yekê di nav sînorê bawerî û nebaweriya vî zimanî de hestên xwe çêtir radigihînim. Her çiqas hevokên kompleks û analîtîk yên Tirkî û hevokên ji dil û kurt yên Kurdî di mejiyê min de şer bikin jî min çareya vê yeke dît û hevsengiyek ava kir di nav wan de. Sal 2023; weke yeka ku ez dizanim ku nivîs ji bo min şîfa ye lê ev 3-4 salên dawî ne nanivîsim, nikarim. Pir zêde wergeran dikim, gelek lênûskên piçûk yên nîşeyan digirim, ez bala xwe didimê ku bi awayekî herî sade, herî kurt çawa dikarim rojê biqedînim. Ez ferq dikim ku argûman û zimanê raporan di jiyana min ya rojane de cihê xwe zeft kiriye û her diçe mekaniktir dibim. Ez dizanim ku gelek bîranîn, agahî û çîrokên ji alîyê min ve li hêviya nivîsînê ne, lê dîsa jî nikarim xwe bidimê… Kesekî ku ketiye tora pergaleke otomatik, dê çawa bîne bîra xwe ku kesayetek e?

Baş e, ma sedem tenê ev bû? Min bi wêrekî dîsa ji xwe pirsî, çima nanivîsim? Weke jinên ciwan yên ku edebiyat û hevok ji xwe re kirine derd, em çima

> Min cara yekem kengî dest bi nivîsê kiribû. Ji nav van du zimanên ku ez herî baş dizanim nivîsîna kîjanê ji min re rehet tê? Bêhemdê xwe ez çerxa demê bi paş ve dibim û rêwitiyekê dikim.

nanivîsin an kêmtir dinivîsin? Kêmnivîsandina me bêguman bi vê tehekûma ku hezar salan e didome di nav pêwendiyekê de ye. Sedemên cur bi cur hene û ev sedem li gor civakan diguherin jî. Mirov bêrekê li devê wan kesan bixe ku dibêjin kê bi destê we girtiye, hûn nikarin biafirînin, kî ji we re gotiye nenivîsin? Bêdengî ye? Mîna sed salan e em ji normên zayendiya civakî heta derfetên perwerdehiyê, ji endîşeyên ewlehiyê hetanî erkên civakî xal bi xal rave bikin, an bêyî ku bêjin mêr çi dibêjin em wê binivîsin? Hemû nivîskarên baş wextê ku dixebitin nivîsên xwe naecibînin. Ji ber ku haya wan ji potansiyela wan heye û di wê baweriyê de ne ku nikarin bigihêjin wê. Dema ku van yekan dinivîsim û di nav vê gelemşeyê de xema vegera li nivîsê li ser min e, nîşeyeke Sara Ahmed ya ku di pirtûka wê ya 'Living a feminist life' (Jîneke Femînîst) de derbas dibe hat hişê min: "Dema ku min ev pirtûk dinivîsand min ji berê bêhtir xwest nêzî tiştên rojane bibim. Ev pirtûk takekesî ye, tişta takekesî jî teorîk e. Teorî bi piranî razber tê hesibandin. Tiştek çiqas razber be, ji jiyana rojane çiqas dûr bikeve ewqas teorîk e. Razberî dûrxistin, veqetandin an jî cihêkirin e. Wê çaxê divê em teoriyê bi şûn ve bikişkişînin û vegerînin jiyanê."

Kerem bikin ev jî tenê çend dilop hibir ji qelema min. Belkî jî min ji bo ku jiyana xwe ya razber şênbertir bikim gavek avêt. Belkî jî em ê bibin mîna qelemên Sîma Semend, Ursula Le Guin, Agatha Christie an ji ber siya wan re jî derbas nebin… Belkî jî di vê jiyana online de ku tehemûla kesî ji tiştên dirêj re nemaye û tenê kêliyê dijîn dê qet neyê xwendin.  Lê dîsa jî digel zanebûna van hemû tiştan ez ê li nivîsê vegerim nizam?

# Du kitêp û nivîskarekî dilsoz

❖ erd AGRON

◗ Min bi eşq hemû pirtûk xwendin. Yên ku min pir ecibandin jî yên ku min rexneyên xwe lê dikirin jî hebûn. Lê hemû bi Kurdî bûn û hemû jî li ber dilê min şêrîn bûn. Lê ji nava wan du pirtûk bi dengekî bilind digotin "va em li vir in." Du pirtûkên ji serkaniya wêjeya me ya hemdem tevlî dîroka wêjeya Kurdî-kurmancî dibûn.

Ji ber ku dizanin tariya zindanê bi şuhleya ziman ronî dibe serdestan dîsa Kurdî li hundir qedexe kirine. A rast ji xwe zagoneke ku Kurdî li zindanan serbest bike heta niha ji xwe tunebû, di filiyatê de pêşî lê hatibû vekirin. Ev demeke dirêj e dîsa pêşî lê hatiye girtin. Nameyên bi Kurdî winda dibin, nivîsên bi Kurdî tên desteserkirin û pirtûkên Kurdî ne ji ber peyvekê, bi dilê xwe qedexe dikin, yên ku ti hêncetê jê re nabînin jî bi mehan di destê xwe de dihêlin û teslîm nakin.



Dema tu nerazîbûnên xwe tînî ziman û balê dikişînî ser vê cudakariyê, heft sondan dixwin û dibêjin "em cihêkariyê nakin. Bi Îngilîzî, Almanî heta bi erebî bûna ti pirsgirêk tunebû. Lê em jê fêm nakin, Kurdiya wan pir cuda ye, kesî bixwîne nîn e." Halbûkî ji sedî sî-çilê wan Kurd in û bi Kurdî dizanin. Lê ne ew gardiyan bi yên Kurd bawer in ne jî yên Kurd bêtirs diwêrin xwe li vî karî biqelibînin. Helbet mijara vê nivîsê ne ev e. Lê weke têketina nivîsê pêwist bû ku van jî binivîsim. Ji ber ku illeh têkiliyek pê re heye.

Di Tîrmeha 2022'yan de bi qasî deh-panzdeh pirtûkên Kurdî ji min re hatin. Dema ku pirtûk tên her kesê ku ne xerîbê zindanê ye, (ka ma kijan Kurd xerîb maye ji zindanê?!) dizane ku berpirsiyarên girtîgehê bi hûrgilî pirtûkan vedikolin ka tiştek xetere an jî qedexekirî dihewîne an na. Îca min ji van pirtûkan ya herî dawî di Çileya 2023'yan de ji nav lepên wan derxist. Ger ku tiştek din bûna herhal min ê bigota bila jehr têkevê û ez ê jê biqeriyama. (Ev çar sal in ji ber rengê wan hinek cilên min di nav destê wan de ne û ez rojeke xwedê jî li pey neketim.) Lê ma pirtûk wisa ne qey… tew îca ku bi Kurdî bin..!

Min bi eşq hemû pirtûk xwendin. Yên ku min pir ecibandin jî yên ku min rexneyên xwe lê dikirin jî hebûn. Lê hemû bi Kurdî bûn û hemû jî li ber dilê min şêrîn bûn. Lê ji nava wan du pirtûk bi dengekî bilind digotin "va em li vir in." Du pirtûkên ji serkaniya wêjeya me ya hemdem tevlî dîroka wêjeya Kurdî-kurmancî dibûn. Du pirtûkên Nurî Hîzanî (ku min ev nav cara ewil dibihîst) "Hub û Xebat (2021-Lîs) û " Şewqa Sibê (2022-Lîs)". Îbrahîm Bulak dîsa bi karekî pîroz xwe nîşan daye û pirtûk amade kirine. Em Îbrahîm Bulak ji bihîzyarî û pêjinkiriya wî ya derbarê wêjeya Kurdî û xebatên wî yên nivîskî nas dikin. Berî pirtûkên Nurî Hîzanî, pirtûka Mîkaêlê Reşîd ya bi navê Wede-Pencere-Mitale, (Belkî- 2019) amade kiribû û weke zêrekî neşikandî diyarî wêjekar û wêjehezên kurmancî kiribû. Belkî Îbrahîm bi van hewildanên xwe dixwaze ji me re vê bibêje: "Heger tu bixwazî pêşiya xwe bibînî, li pişt xwe binêre." Yanî herçî ku li pişt xwe nenêre, pêşiya xwe nabîne. Ji bo wêjeya Kurdî jî îro ya esas ev e. Lipaşxwenihêrîn, bi gotineke din pêşiyaxwedîtin e.

Di pêşgotina pirtûka bi navê "Hub Xebat" de Îbrahîm Bulak di derbare jiyan û nasnameya Nurî Hîzanî de agahiyên pêwîst parve dike û dibêje "Nurî Hîzanî Kurdîzimanekî Ermen e. Navê wî yê Ermenkî Hovakîm Margaryan e. Hîzanî sala 1896'an li Hîzana Bilîsê, li gunde Xakêvê tê dinyayê. Ji ber zilma osmaniyan derbasî Ermenistanê dibe. Xwendina xwe li Rewanê dike û di Teknîkûma Kurdanî Pedagojiyê de dersdariyê dike, gelek pirtûkên dersê tercûmeyî kurmancî dike. Bi heman awayî helbest û gotinên xwe di Rêya Teze de diweşîne.

**Hub û Xebat**

"Rojek ziktêr, yek zikbirçî,
Rojek dilkul, dilbirîndar:
Oktyabra sor şeveq anî
Bi tîrêncêd şewq û zelal."

"Hub û Xebat" pirtûka Nûrî Hîzanî ya helbestan e. Her çiqas bi çarîne û beytan helbestên xwe nivîsandibe jî mirov nikare bibêje Nurî Hîzanî bi forma klasîk helbestên xwe hûnandine. Teşeya klasîk teşeyeke diyarkirî ye, qalibek amade ye. Ger ku li gora divêtiyên wê neyên nivîsandin ew helbest encax dikarin weke helbestên serbest (modern) werin pênasekirin. Ev nayê wê wateyê ku helbesta serbest helbesteke bêteşe ye. Ew bi teşedayîna helbestvan dîşêwe û bi pîvanên xwe resen û xweser e. Wê çaxê em dikarin bibêjin ku helbestvan Nurî Hîzanî li gel ku xwestiye forma klasîk bi kar bîne jî helbestên serbest nivîsîne.

Ji helbestên wî jî diyar e ku pir guh nedaye hêmanên teşeyî û naverok esas girtiye. Naveroka helbestên wî jî şoreş, êşên civakî, jiyana Kurdan û kesayetên dîrokî yên Kurd ku xwedî tesîrên mezin bûne pêk tê. Dengbêjî, Feqiyê Teyran, Nurî Dersîmî, Elîşêr, jiyan û çanda Kurdan hêmanên vegotina wî ne, lê dilsoziya wî ya bo biratiya Kurd û Ermenan di nav hemû helbestên wî de xwe dide der. Bi taybetî jî ev xwezî û dilsozî di helbesta wî ya bi navê Kerîk ji poêma Tarîxa Mîrê Miksê, bi vegotineke paqij tê ravekirin. Ma dê di vê helbestê de Nurî Hîzanî hevgirtina dil û mejiyê xwe bi kijan zimanê figuratîf îfade bikira, dê serî li kîjan hêmana teşeyî bidaya?

Weke Şikoyê Hesen, Mîkaêle Reşîd, Fêrikê Ûsiv, wî jî dilxwaziya xwe ya şoreşê ya sovyetan û hezkirina xwe ya ji Lenîn re aniye ziman û wesifdayîna wan li ser xwe ferz dîtiye. Ji ber ku biratiya gelan, wekheviya jin û mêran û azadî, di pêşengiya Lenîn de li sovyetan pêkan dibîne. Helbesta wî ya bi navê Qurilta Meşûr, hemû bawerî û bendewariyên wî rave dike. Mirov dikare bibêje ev helbesta wî niviştek e li hember her cure xirabiyên dijî şoreşê.

Xwestiye tesîra şoreşê ya li ser Kurd û Ermeniyan kiriye di kesayeta dengbêjên wan de rave bike. Helbesta wî ya bi navê Dengbêjêd Berê û Êd Niha, behsa daneberheva dengbêjên berê û yên niha (yên serdema xwe) dike. Wiha dibêje:

"Ew dengbêjêd bê pişt mil in,
Bê maş, bê heq û dilkul in,
Lê gumana xwe naborin.
Mane hîviya şeveq û tavê."


Di heman helbestê de rewşê wiha rave dike:

"Rojek ziktêr, yek zikbirçî,
Rojek dilkul, dilbirîndar:
Oktyabra sor şeveq anî
Bi tîrêncêd şewq û zelal."

Û di pey re behs dike ka jiyan çawa xweş bûye, ji hemû xirabyan ferikiye, cahilî çawa ji holê rabûye, derd û nalîn çawa winda bûne, dengbêjan çawa bi eşq dest bi methê xwediyên xebatan kirine û nexşên sorgulî çawa nîgar kirine.

"Hûnandiye bi tayê zêrîn
Ji keziyê bûkan, kûmê xortan,
Ji dilê dostan eşq û şîrîn,
Nexş hûnandin kesk û rengîn."

◗ Weke Şikoyê Hesen, Mîkaêle Reşîd, Fêrikê Ûsiv, wî jî dilxwaziya xwe ya şoreşê ya sovyetan û hezkirina xwe ya ji Lenîn re aniye ziman. Ji ber ku ew biratiya gelan, wekheviya jin û mêran û azadî, bi pêşengiya Lenîn li sovyetan pêkan dibîne. Helbesta wî ya bi navê Qurilta Meşûr, hemû bawerî û bendewariyên wî rave dike. Mirov dikare bibêje ev helbesta wî niviştek e li hember her cure xirabiyên dijî şoreşê.



Helbestê bi vê çarînê diqedîne û dibêje:

“Mîna refê baz û sîmûr
Kilamêd wan diçin pir dûr,
Sewt û deng û miqamê wan
Manê li dilê Nuriyê Hîzan.”

Dema ku mirov vê helbestê dixwîne bivê nevê Radyoya Erîwanê tê bîra meriv, ku bi rastî jî dengê dengbêjên wê pir diçe dûr. Nurî Hîzanî bi helbesta xwe ya bi navê Feqiyên Teyran Ra mizgîniya şoreşê dide Feqiyê Teyran û dibêje:

“Pir çetîn bû zimanê te:
Ereb, Mongol, fars û hûnan,
Şer dikirin li welatê te
Welat kirin perîşan.

Destxetê te, dûr û mircan
Ma nav kunc û gozê xaniyan,
Ew çend qurnê zelûlî bûn,
Hatin û çûn ser Kurdistan
(…/…)
Zeman niha xweş e feqî
Wan Dîlberan girtî nîn in,
Aza, serbest û xwedî ne
Di welatê şewristan in.

Li tax û gund xaniyêd Kurdan
Şewq vedaye medenyetê,
Qet kî dîtibû sal û zeman
Nav tarîqa Kurdistanê.”

◗ Dema ku em behsa înşaya neteweya demokratîk dikin, bi heman awayî em qala ronesanseke dikin ku teqabilî ruh û vîna gelên Kurdistanî ya kevnar dike û wan nûjen û zindî dike. Ma ne ronesansa Ewrûpayê li ser esase zindîkirina dîrok û çanda Grek-Romayê pêk hatibû. Kî ev jî di dîroka mirovahiyê de qonaxek ji qonaxên dîrokî yên neteweya demokratîk civaka dîrokî bû. Loma jiyana gelên Kurdistanî ji yek ji esasên sereke yên ronesanseke ye.


Dema ku em behsa înşaya neteweya demokratîk dikin, bi heman awayî em qala ronesanseke dikin ku teqabilî rih û vîna gelên Kurdistanî ya kevnar dike û wan nûjen û zindî dike. Ma ne ronesansa Ewropayê li ser esase zindîkirina dîrok û çanda Grek-Romayê pêk hatibû. Kî ev jî di dîroka mirovahiyê de qonaxek ji qonaxên dîrokî yên neteweya demokratîk civaka dîrokî bû. Loma jiyana gelên Kurdistanî ji yek ji esasên sereke yên ronesanseke ye. Dema ku em bi vî awayî li berhemên wêjeyî yên gelên rojhilata navîn binêrin em ê dane û hêmanên pevrejiyana gelan bibînin. Nurî Hîzanî di vî warî de jî xwedî giringî ye. Her çiqas di berhemên xwe de ji civaka Ermenî bêtir xwe li civata Kurd girtibe jî ew xizimtiya Kurd û Ermeniyan esas digire. Fikir û nêzîkatiya xwe di vî warî de di helbesta xwe ya bi navê “Kerîk”ê de ku di poêma “Tarîxa Mîrê Miksê” de derbas dibe, tîne ziman û ev nêzîkatî diniqute gelek helbestên wî jî. Divê ku ev pevrejiyan, ev biryardariya jiyanê were zindîkirin. Di vî warî de Nurî Hîzanî nîmetek e. Helbet ku dema bi disîplînên cuda cuda helbestên wî werin dahûrandin em ê ratsî gelek daneyên din jî werin.




**Şewqa Sibê**

Şewqa Sibê kitêba Nurî Hizanî ya çîrokan e. İbrahîm Bulak îdîa dike ku ev yekemîn pirtûka kurteçîrokên modern e ku di sala 1934’an de li Rewanê çap bûye û wiha didomîne: “Vê kitêbê heta niha zêde bala kesî nekişandiye, loma bi şaşîtî hatiye gotin ku ‘Nûbar’a wezîrê Nadêr yekemîn pirtûka hîkayeyên kurmancî yên modern e ku salek piştî “Şewqa Sibê” çap bûye. Di demên pêş de dibe ku ji bin kavil û xirbeyên dîroka me berhemine din derkevin û em bibêjin a ewil ev e. Ma jixwe dîrok ne zanisteke xwendina rabirdûyê ye? Lê aniha dê ti kes li ber vê angaştê ranebe ku yekemîn pirtûka çîrokên modern a kurmancî “Şewqa Sibê” ya Nurî Hîzanî ye. Û em ê bi dilekî rehet bibêjin her kî bi Kurmancî çîrok binivîse û hay ji Nurî Hîzanî tunebe dê çîroka wî nîvco bimîne. Ji ber ku me gotibû “tu li pişt xwe nenêrî tu dê pêşiya xwe nebînî.”

Di vê pirtûkê de jî bala meriv dikişîne ku Nurî Hîzanî di çîroknûsiya xwe de jî ne li pey hevsengiya naverok û teşeyê ye. Ew di çîrokan de jî bêtir li naverokê disekine. Meyleke propagandîf li ser çîrokên wî serwer e. Şerê sinifan, proleterya, azadiya jinan, wekheviya zayendî û hwd… Bi kinahî derdê wî vegotina şoreşê ye.




Di çîroka xwe ya bi navê “Zelîxê” de behsa jineke Kurd a ku tevlî şoreşê û şerê çînî dibe dike. Di çîroka bi navê “Narê” de felata Narê ya ji qeydên kevnar, dibe navenda vegotina wî. Di kurteçîroka “Kewê” de nakokiyên kesayetên nû û yên kevin, dijberiya şoreş û kevneşopiyên paşverû dide ber hev û balê dikişîne ser rêbaza rast ya rêxistikirin û bernamekirina karên kolektîf. Dek û dolabên dizivirin jî cihê xwe di herka kurteçîrokê de digirin. Di çîroka bi navê “Ebas” de mijara esasî şerê çînî ye. Di şexsê Ebas û Meyremê de, em dibînin ku şivanek û jineke gundî çawa dibin proleter û evîna wan çawa di bin siya şerê çînî de dimîne. Di çîroka bi navê “Eskeriya Memê” de jî em şahidî li ronîbûna Memê ya di şerê çînî de dikin. Mem di ordiya sor de digihîje kemalê. Di çîrokên wî yên din de jî tema naguhere û her bi vî awayî didome. Ya balkêş jî ew e ku Nurî Hîzanî mişt hêvî ye, reşbînî lê nîne û çîrokên wî tev bi çareserî, ronîbûn û bextewariyan diqedin. Ev jî xaleke giring e ku divê bo çîroknûsiya Kurdî bibe mînak. Her hêla jiyanê dramatîk an jî trajîk nîne. Her çîrok ne mecbûr e bi kuştinê, bi mirinê yan jî bi veqetin û girtinê biqede.

Ji ber meyla wî ya propagandîf karekterên Nurî Hîzanî yekalî ne, qels in, kêm in, xav in û di kesayeta wan de valahiyên beloq hene. Jixwe bi rehetî tê fêmkirin ku ew xwe nade zorê ku ileh karakterên xurt biafirîne û zimanekî wêjeyî bi kar bîne. Di vî warî de bêxemiyek lê dixwiye. Heman bêxemî di Cîm û Gulperiya Cigerxwîn de jî heye. Hema ji karakter re gotine rabe, karakter jî rabûye û mecbûr maye tiştên di serê nivîskar de dubare bike. Lê li gel vê jî tiştek ji giringî û nirxê yekemînbûna xwe ya di dîroka kurmancî de kêm nake. Divê ku çîroknûs û vebêjerên Kurd vê pirtûkê bixwînin. Ji ber ku dê çîrokên xwe ji dera ku Nurî Hîzanî hiştiye binivîsin û yên nîvcomayî jî temam bikin.

Helbet mirov dikare gelek tiştan li ser her du pirtûkên Nurî Hîzanî bibêje û binivîse. Bi ya min Îbrahîm Bulak gelek tiştên pêwîst di pêşgotinê de bi me re parve kirine. Ez li hember dilsoziya Nurî Hîzanî û keda Îbrahîm Bulak rêzê digirim û spas dikim.

Hêvî dikim ku herkes pirtûkên Nûrî Hîzanî bixwîne.

◗ Di vê pirtûkê de jî bala meriv dikişîne ku Nurî Hîzanî di çîroknûsiya xwe de jî ne li pey hevsengiya naverok û teşeyê ye. Ew di çîrokan de jî bêtir li naverokê disekine. Meyleke propagandîf li ser çîrokên wî serwer e. Şerê sinifan, proleterya, azadiya jinan, wekheviya zayendî û hwd… Bi kinahî derdê wî vegotina şoreşê ye.



# Derbarê erdhejê de û kêmasiyên me yên di vî warî de

Ferhat BUGDAY

Kurdistan û Tirkiye, şeva 06.02.2023an hişyarî rokeje weke qiyametê bûn. Destpêkê qîjîna dêya min û birayê min hat guhê min, dawiyê jî ji xew şiyar bûm û min dît ku cihê min û refên pirtûkên min dilerizin. Ewil min got ev erdhej jî mîna yên berê dê zû xilas bibe, lê hema bêje ji deqîqeyekê derbas bû. Ez jî hema ser cihê xwe rabûm û min xwe avêt derve. Gava derketim derve, min halê malbata xwe û nasên ku li taxa me rûdinin pirsî û min dît ku hemû baş in. Piştre ez hema ketim twitterê û min lê nêrî ka erdhej li ku çêbûye. Min dît ku tewerê erdhejê Mereş e. Piştre hêdî hêdî bangên xilasiyê yên ji herêmên erdhejê li ser twitterê belav bûn. Wê çaxê min fêhm kir ka em di nav bobelateke çiqas mezin de ne.

Dawiyê jî seva ku ez jî Semsûrî bûm, bi tirs min telefon li nasên xwe kir ku li Semsûr û Rihayê dijîn. Piraniya wan gotin ku tenduristiya me baş e lê ji ber şideta erdhejê gelek mal xirab bûne û pir kes di bin kavilan de mane. Her çiqas başbûyîna nasên me dilê me rihet kiribû jî, hîna pir hevalên me telefonên xwe venekiribûn. Gava bû şeveq, min li ser medyaya civakî hinek wêneyên xirab dîtin û bi rastî ketim nav qurfeke mezin. Cihên ku her sal diçim û dibînim, hemî xirab bûbûn, pir mirov di bin kavilan de mabûn û li benda xilaskirinê bûn. Wê ez fikirîm ka dikarim çi bikim da ku ji Mêrsînê bigihêjim hewara mexdûran. Mixabin, bi tena serê xwe tiştek ji destê min nedihat. Loma ez fikirîm ku dikarim xebateke hevbeş û kolektîf pêk bînim. Mirovên li Tirkiye û Kurdistanê seva ku bi piranî twittere xweş bi kar tînin, ez jî li ser bangên twitterê hûr bûm. Min destpêkê tweetên bangawaziyê yên mirovên ku li cihê erdhejê dijîn, yên kesên ku nasê xwe ji ber erdhejê winda kirine an jî agahiyê ji wan nastînin û yên ku nasên wan di bin kavilan de mane, li ser rûpela xwe jî parve kirin û dengê wan gihande mirovên din.

Halê hazir ji ber ku dizanim dewlet û saziyên wê di her bobelata bi serê me de tê xwe ker û lal dikin, min jî gazinên xwe yên di vî warî de ji bo dewlet û saziyên wê anîn ziman. Ne tenê ez, bi milyonan mirovî gazinên xwe ji wan kir û hîna jî dikin.

Gava ku ketibûm ser şopa van bangan, min dît ku xebereke nû ket ber min. Waliyê Semsûrê derketiye hemberî rojnamegeran û mirovên ku ji erdhejê filitîne jî hatine ba wî û alîkariya wî dixwazin. Lê belê ji ber ku kêfa wî hatibû an qelfa xwe bi mexdûrên erdhejê dikir nizanim, dikenî. Her çiqas ew kena waliyî dilê min êşandibe jî ez dizanim ku devlet/desthilat li Kurdistanê li ser êşên me tim lotikan diavêje. Çimkî dewlet bi gotina Arendt "Awayê herî tund û piştrast yê xwedîbûnê rûxandin e, çinku em baş dizanin ku encax tişta ku me heta hetayê ji holê rakirî aîdî me ye."

Dewletê jî baş dizanî her çiqas berpirsiyarê vê bobelatê ye, ew ê bikare bereksî vê yekê xwe wekî xilasker nîşanî gel bide. Çinku hemû derfet û destûr di destê dewletê de ne, loma kengî bixwaze dikare were kavilan rake, mirovan ji bin kavilan xilas bike. Çinku tekane daxwaza gelî xilasî ye di wê rewşê de. Loma heger vê yekê bike, gel dîsa dê jê bawer bike û bi vî awayî dewlet dê ji tawanên lê têne barkirin xilas bibe.

Gava ku gel li dijî xwestina bacê, jêkirina daran an jî tiştek din a nerast piçekî dengê xwe bilind bike devlet bi tang û topên xwe, bi lez û bez tê ber deriyên me. Lê di rewşên hewce de, li cihên ku diviya dewlet lê hazir û nazir be, wekî her gavê vê carê jî dewleta Tirkiyeyê ne ku dereng hatibû, nehatibû.

Dewletê di serî de cihên ku erdhej lê çêbûye wek herêma bobelate îlan nekir û leşker ji leşkergehên xwe derneketin. Bi saya biserdeçûna gel û medyayê dewlet ket zorê û cihên erdhejê wek herêma bobelatê îlan kirin. Piştre leşker daketin qadê û di alîkariya lêgerîn û filitandinê de cihê xwe girtin. Her çiqas Wezîrê Parastinê yê Tirkiyeyê derket û got leşker dema erdhej çêbû hema daketin qadan û dest bi alîkariyê kirin jî gelên ji erdhejê ew gotin derewandin û gotin leşker pir dereng hatin û hatina wan jî xera serdeçûna me bû. Serokkomarê Tirkiyeyê û serokê AKPyê Tayyip Erdogan dawiyê bixwe jî got em dereng man ji bo alîkariyê.

> ◗ Ya herî giring jî ew e ku em xwedî rêjeyeke mezin a xwendeyên Kurd in. Ne tenê qala Bakur dikim, em xwedî wê hêzê ne ku ligel her çar parçeyên Kurdistanê vê yekê bikin. Em dikarin ji zanîn û perwerdeya xwendeyên xwe sûd wergirin û tîmeke têra xwe xurt ava bikin. Me têra xwe endezyar, bijîşk, derûnnas û karmend hene.

Belê ji ber vê pratîk û helwesta keyfî ya dewletê ev barê giran ma li ser milê gelê Tirkiye û Kurdistanê. Çend saziyên sivîl bi lez û bez hatin ba hev û hema ber bi herêmên erdhejê derketin rê. Gel jî ket şopa wê yekê ka dikarin demildest çi bikin.

Wê demê ez û çend hevalên xwe jî hatin ba hev û me lîsteya hewcedariyên lezgîn çêkir. Paşê da ku piştevaniya me bikin me bangî xêrxwazan kir. Xêrxwazan demildest bersiva bangên me dan û lazimiyên lezgîn gihandin ber destê me. Me jî dest bi koordînasyonê kir û ji bo lazimiyan bigihînin cihên erdhejê, me bi lez û bez erebeyeke mezin dît.

**Rêwîtî, êş û têkçûna hestyarî**

Gava em derketin rê, me kêm zêde dizanî ka têkçûyîna hestyarî dê çewa tesîrê li ser me bike. Mîna zarokên ku pêlîstokên wan ji wan hatî girtin. Axir, piştî em derketin rê bi demeke kin gihîştin navçeya Dîlokê ya bi navê Nurdagiyê. Wextê ku em berê ji vir derbas dibûn, gelek çira pê diketin. Lê îro çi mal çi jî kolan hemû çira vemirîbûn. Tevî ku xewa me nedihat lê ji bo ku me nedixwast em wan dîmenên reş û tarî bibînin, me çavên xwe digirtin. Çimkî me dizanî ku gava em bigihêjin Semsûra ku zarakotiya me lê derbas bûyî, dê dîmenên xirabtir me pêşwazî bikin.

Erebe êdî gihîşt sînorên Mereşê. Her çiqas li navendê pir kavil tine bûn jî, li navçeya Pazarcixê, cihên ku berê me dîtibûn hemî wêran bûbûn. Piştî Pazarcixê em çûn navçeya Semsûrê ya Golbaşiyê. Dema em ketin bajêr te digot qey fîlmeke tirs û xofê tê kêşan, ewqas xirab ewqas bêdeng bû. Apartmanekê tenê jî saxlem xuya nedikir. Li ser hin kavilan piçek xebatên xilaskirinê pêk dihatin, lê gelek kavilên din jî hîna wekî xwe mabûn. Em gelek diêşiyan, ew kolanên ku dema em zarok, em lê dikenîn û digiriyan niha êdî tine bûn.

Golbaşi yek ji cihên herî zêde xirabûyî bû. Bajêr mîna ku ketibû kuneke reş û tarî. Li ber wan kavilên bêserûber em derbas bûn û ber bi hilatina tavê em gihîştin bajarê Semsûrê. Li wir jî rewş mîna Golbaşiyê bû. Cih û mirovên ku me berê de nas dikirin êdî heya ebediyetê dinyaya xwe guherandibûn. Axir, bîranîn û salên zarokatiya me di nav kavilan de winda bûbûn.

**Kêmasiyên dewletê**

Di serî de min çend kêmasiyên dewletê anîn ziman. Niha di berdewama nivîsê de jî ez ê çewtî û bi berfirehî kêmasiyên dewletê binivîsim.

- Dewlet çawa bi derengî giheşt bangên xilasiyê yên erdhejên berê (Wan, Îzmîr, Xarpêt, Çewlîg), îro jî dereng gihişte vê erdhejê. Ji ber vê derengmayînê gelek mirov bê av û nan, bê ceyran man û ji ber wan kêmasiyan jiyana xwe dest dan.

- Dema dewletê navê bajarên ku erdhej lê qewimiye aşkere kir, navê Semsûrê neda. Îdîayeke gelek muhîm heye ku dibêjin Waliyê Semsûrê, dema ku AFADê jê re telefon kiriye û rewşa bajarî pirsiye, wî gotiye li Semsûrê rewşeke xirab tine ye û bila herin bajarê Rihayê. Ev ew walî ye ku bê fêdî li rûyê mexdûrên erdhejê dikeniya.

- Erdhejê nêzî deh bajar ser û bin kiribûn. Loma dema ku alîkarî dihatin bi peyatî an jî bi seyareyan gihandina wan zehmet bû. Dewletê, tevî ku ewqas methê balafirên xwe dide, ku dikarî di çend rojan de van alîkariyan belav bike, dîsa xwe da kêlekê.

- Dewleta ku alîkarî nedikir, ji hêla din ve alîkariyên ji pêkhateyên mixalif ên civakê dihatin asteng dikirin. Dest didanî ser tiran, kesên ku ji bo alîkariyê dihatin wekî diz nîşan didan û bi rêya polêsên xwe îşkence li wan dikir û heta qayûm jî avête ser depoyên ku bi destê HDPyê hatine vekirin. Dema mirov van hemûyan dibîne vê pirsê neke nabe: Gelo dewletê bi rastî jî dixwest em bimirin?

- Li ser televîzyonê pereyeke mezin hate komkirin, gelek navdaran li wê derê xwenîşandan û şîneke sembolîk pêk anî. Kes nizane ev pere çû zikê kîjan rayedaran. Tevî dozgeran dikarî li ser vê yekê dozê vekin û hesabê vî pereyî bipirsin, ew dîsa ketin dû berjewendiyên dewletê.

- Konên ku dihatin belavkirin kêrnehatî bûn. Jixwe wekî we dîtî jî an bi agirekî an jî di baraneke nişkgav de xirab dibûn û dişewtîn û bi xwe re çend canên din jî dibirin. Yanî xêra wan jî dibû zerer.

- Dawiyê serokê AHBAPê Haluk Levent derket û daxuniyek da û got me li ser navê AHBAPê ji KIZILAYê kon, xurek û kinc bi peretî girtin. Piştî vê rewşê derket holê ku KIZILAY li ser navê şîrketekê tê xuyan. Yanî saziyeke ku hemû gel wisa dizane ku saziya dewletê ye û di rewşên lezgîn de ji bo alîkariyê hatiye damezirandin û ji ber vê yekê jî pereyî dibexşînin, esasen ne aîdî gelî ye. Ev sazî jî zikê alîgirekî têr dike.

- Li her derê depremzedeyan banga av, kon û lazimiyên tenduristiyê dikir. Dewletê jî digot em gihîştin her derê û kêmasiyek nîne. Her wiha daxwaza dewletên ku dixwestin destê alîkariyê dirêj bikin jî red dikir û digot kêmasiyek tine ye. Lê li aliyê din gelek kes ji neçarî û bi tirseke mezin diketin malên xwe yên xisar dîtî. Eger neketina mala xwe dê ji serma miriban. Gava mirovan li ser medyaya civakî ji bo Xetay, Semsûr, Meletî û Mereşê av dixwest, dewletê ev kes wek xayin îlan dikirin û li dijî wan doz vedikir.

- Dawiyê her kes bi miriyê xwe ve bi tena serê xwe ma. Qet nebe dikarîn di vî warî de hin tiştan bikin. Lê malbatan bi destên xwe miriyên xwe derdixistin. Wekî heşrê bû, heger deng ji kavilan bihata wê demê tîmên xilaskirinê dest diavêtin rakirina kavilan. Heger deng nehata jê derbas dibûn. Lê ma mirî û zindî can her ne can e! Kî biryara vê dide? Ev di her warî de kêmasî ye ji bo dewletê. Çi hiqûq, çi mirovahî, çi dîn, çi jî edetî.

Kêmasiyên dewletê helbet pir in, lê naxwazim hemûyan li vir binivîsim û nivîsê dirêj bikim. Her wiha her çiqas min xwest ez kêmasiyên dewletê binivîsim jî min nekarî xwe ji rexnekirinê bidim paş. Çinku ev ne kêmasiyên ji mesûmiyetê ne. Ev kêmasiyên ku bi zanebûn hatine kirin, her roj li dereke din a Kurdistan û Tirkiyeyê dibin sedema bobelateke din.

**Kêmasiyên me**

Destpêkê hewce ye ku ez "EM"ê hinekî zelal bikim ka ez behsa kî û dikim. "EM", bi saziyên xwe yên sivîl, bi şaredariyên xwe, bi baro û komaleyên xwe û bi partiya xwe, me Kurdan nîşan dide.

Dixwazim di serî de vê bêjim ku em çiqas spasiya gelê xwe bikin jî dê kêm bimîne. Ciwanên me yên ku ji her derê Tirkiye û Kurdistanê hatibûn, çi ji destê wan dihat bê gilî û gazin dikirin. Tew xebata bikoordîne ya gelê me yê Amedê em kelogirî dikirin. Gelê Rihayê, ji ber nêzîkbûna xwe ya bo Semsûrê her kêliyê tiştek dişand. Bi erebeyên xwe dihatin û diçûn gundên çiyayî û xwarin, kinc digihandin ber destê gundiyan. Li herêma pîşesaziyê ya Semsûrê jî depoyek mezin hebû, gelek tişt hatibûn tesnîfkirin û ciwanên me hema bêje 24 saetan bêyî bêhna xwe vedin dixebitîn. Ez rastî çend ciwanan hatim ku ji çavên wan xuya dikir ku çend roj in bê xew mane û ji hal ketine. Gava min ew hevalên xwe yên ciwan dîtin bi rastî li ser navê me hêviyeke mezin di dilê min de çêbû.

Lê tevî van hemûyan heq e mirov rexneyên xwe jî bîne ziman.

- Gava me çend nas û hevalan dest bi rêwîtiya xwe kir, me digot qey em tenê ber bi cihê erdhejê ve diçin. Destpêkê em çûn çend gundên ku me berê tesbît kiribûn ku alîkarî ji bo wan neçûye. Me bi qasî hewcedariyê tiştên xwe belav kirin û yên mayî jî me li ser daxwaza hevalan birin Cemxaneya Karapinarê. Gava em gihîştinê, gelek mirov hebûn û hewşa wê pir qerebalix bû. Hingê nehaydariya me ya ji hev wekî yek ji mezintirîn kêmasiya me derket holê. Tevî ku ciwan pir bûn û hewş û hundirê cemxaneyê tijî kiribûn, mixabin her tişt ketibû nav hev. Ev jî kêmasiya me ya koordînasyonê nîşan dide.

- Ma em Kurdên ku dibêjin em bi qasî pêncî milyonan in, çima me nekarî em qasî Xetayê dengê xwe bilind bikin? Helbet ez baş dizanim ku di vê rewşê de mijara kolonyalîzmê jî rola xwe dilîst. Lê ma hema me nedikarî em dengê xwe bigehînin her derê cîhanê û wan ji vê bobelatê haydar bikin, da ku sax, birîndar û miriyên xwe ji bin wan kavilan derînin? Çima me xwe evqas bêçare hişt û ji hêlekê ve em li benda rehma dewletê man? Tevî ku em derbarê vê dewletê de ewqas xwedî tecribe ne, çima?

- Çima ewqas salan şaredarî di destê me de bûn ku ev hêzeke mezin e, me ji bo bobelat û erdhejan tîmeke profesyonel ava nekir? Bo çi dema hêz di destê me de bû û tevî ku me dizanî welatê me welatê erdhejan e, me bi tenê rikeberiyeke siyasî kir? Rast e bobelat xwezayî ne, lê ma ev ne kuştin û qetlîam? Nexwe ev jî mijareke giring a siyasetê ye. Me dikarî berî her tiştî em ekîbeke ku zimanê me dizane ava bikin. Ekîbeke ne girêdayî dewletê û telîmatên wê. Ekîbeke hazir û nazir ku ji her aliyê ve têra bobeletên xwezayî bike û bikare koordînasyonê ava bike û xwedî alav û malzemeyên rizgarkirinê be. Ez dibêjim ne zehmet e ne jî dereng e bo me milletê Kurd.

- Çima ne zehmet û direng e wê jî bêjim: ewqas dewlemendên wî miletî hene, dikarin bi rehetî piştgiriya darayî bikin da ku dema roja felaketê hat, bikarin bibin merhem û birînên gelê xwe. Divê xwe ji vê berpirsiyariyê nedin paş.

- Her wiha gelê me yê li dîasporayê ku bi salan e koçber bûne û kêm be jî bo xwe pergalek ava kirine, ew jî dikarin hem têkiliyên navneteweyî bi kar bînin hem jî alîkariya darayî bikin. Ewqas dam û dezgehên me li wir hene, hewce ye ew jî gavek berî gavekê li ser vê meseleyê bifikirin. Mixabin ewqas sal in dîasporaya me heye lê hîna jî bo van tiştan tîmeke wan tine ye ku derfetên ewropayê kêm jî be bi kar bîne.

Ya herî giring jî ew e ku em xwedî rêjeyeke mezin a xwendeyên Kurd in. Ne tenê qala bakur dikim, em xwedî wê hêzê ne ku ligel her çar parçeyên Kurdistanê vê yekê bikin. Em dikarin ji zanîn û perwerdeya xwendeyên xwe sûd wergirin û tîmeke têra xwe xurt ava bikin. Me têra xwe endezyar, bijîşk, derûnnas û karmend hene. Her wiha em jixwe xelkekî proleter in. Di her warî de me karker hene. Divê em bibin yek. Çinku dawiya dawî em tenê ne û divê em ji bilî dewletên serdest û dezgehên wan, alternatîfên xwe çêbikin.

- Her wiha evqas sal in em doza xweseriya xwe dikin. Ev yek dîsa bi hêza şaredarî û zanîngehan pêkan e. Lê me heta îro wek siyaseta Kurdî li ser vê yekê gaveke giring neavêtiye. Bêguman hevkariya di navbera van sazî û dezgehên herêmî, dê herêmê xurttir bikin. Dê lazimiyên herêmê baştir bizanin. Wê demê ne ew kesên zimannezan, ew kesên ku zimanê vî gelî dizanin dê ji bo xilasî û hewarê werin. Dê koliyên alîkariyê bi kuç, kevir û alên serdestan neyên dagirkirin. Dê konên bi pênc qûrişan nakin wekî lutfekê li gel neyên belavkirin. Û ya herî giring dê miameleya parsekan li vî gelî neyê kirin.

Ez tenê hêvî dikim ku ev erdhej bibe derseke mezin ji me re û em li ser van rewşan bifikirin. Eger em dîsa şaredariyan bigirin destê xwe ku em hemû dizanin ev îhtîmaleke xurt e, em mal bi mal bigerin û binêrin çend mal li hember erdhej û bobelatan bitirûş yan jî bêtirûş in. Qet nebe em dikarin ji vir dest pê bikin. Dizanim ku em ê berdewama wê bînin. Bes gavek lazim e ku ev gaveke jiyanî ye. Bêyî me kes nikare derd û êşên me fêhm bike û birînên me derman bike.

# Destpêkek li ser heqîqeta

❍Dema gihayekî kûvî li ser axê belav dibe, em wê belavbûnê wek bêarî şîrove dikin lê li bêariya xwe nanêrin. Dema cûreyeke masiyan masiyên din dixwe em vê yekê wek kuştinê û wan cure masiyan jî wek kujer bi nav dikin. Lê em li kujeriya xwe nanêrin.

◆ Berîn Sarı*

Gerdûn qada jiyanê ya bêdawî ye. Enerjî û bûnewerên bêsînor jî cewhera gerdûnê ne. Di nav vê bêsînoriyê de cîhan li gerdûnê parçeyek bêsînor e. Cîhan jî di nav xwe de jiyan û azadiyeke bêsînor dihewîne. Jiyaneke exlaqî û polîtîk bi deh hezaran salan domiyaye li vir. Zindî û bûnewerên cûr bi cûr ahenga xwe ya bi vê xwezaya bêhempa re parastine.

Rola jina xwedawend a di vê agengê de girîng bû. Ew bi afirîneriya xwe bûbû pêşengeke xwezayî, avakereke jiyana exlaqî û polîtîk. Jiyan bi vê rengî diherikî. Heta wê gavê… Gava ku mêrê qurnaz bi hişmendiya pederşahî û serwerî derba yekem li vê ahenge xist. Bi wê derbê mirov û xweza her ku çûye ji hev biyanî bûne. Mirovê xwedî hizra pederşahiyê ji wê demê ve dest bi mêtinkirina xweza û gerdûnê kiriye. Êdî ew bûye kirde, xweza jî bûye objeya wî. Wî xwe li gerdûnê yekane dîtiye û her tişt li gor vê nêrîna xwe şîrove kiriye. Li ser gerdûnê serwerî armanc kiriye. Ji bo vê, kêlî bi kêlî her tişt xistiye pawana xwe. Ji bo ku vê sekna xwe ya jirêderketî meşrû bike jî dîrok, zanist, felsefe, ol û hemû bawerî li gor xwe şîrove kirine. Dîroka beriya hiyerarşî û serweriya mêrperest wek serdemeke tarî û paşverû û mirovên wê demê jî wek hov pênase kirine.

Li gorî teoriya peresanê ya Darwîn hiyerarşî tişteke xwezayî ye, di xwezayê de yên bihêz li ser piyan dimînin an go "masiyê mezin yê biçûk dixwe." Wekî zanista felsefeyê jî dupat dike aqil di ser her tiştî re ye û di gerdûnê de jî bûnewera biaqil tenê mirov e. Li gor olê, Xweda ewilî gerdûn afirandiye û ji bo ku ev yek bê zanîn ango ji bo ku Xweda hebûna xwe îspat bike jî mirov afirandine. Bi vî awayî mêtinkirina xwezayê rewa kiriye. Tehrîbata ku ji vê hişmendiyê qewimiye wekî pencesêrê her roj bêhtir li xwezayê belav bûye û mirov bi xwe jî weke nexweşiyekê li serê xwezayê bûye bela.


Îcar yên ku ketine ferqa xetereya vê rewşê, li ser sedemên vê rewşê pirs ji xwe û derdora xwe kirine, li rêbazên çareseriyê geriyane. Piştî sedsala 19. ev lêgerîn di bin sîwana zanista ekolojiyê de domiyaye. Ekolojî wek peyv cara yekem di sala 1783an de ji aliyê Ernst Haeckel ve hatiye bikaranîn û hêj wê çaxê qels be jî hatiye sîstematîzekirin. Piştre jî ji aliyê tevgerên polîtîk ên ku balê dikişînin ser parastina xwezayê ve wek bingeh hatiye qebûlkirin. Tevgerên ekolojiyê di nêrîn û ferasetên xwe yên derbarê xwezayê de gelek pêşketin bi dest xistine, lê ji ber raman û nêrînên sînordar gelek caran xitimîne.

Em îro dizanin ku çavkaniya pirsgirêkên xwezayê hişmendiya derxwezayî ya mirovan e. Em bi saya felsefeya zanistê ya nûjen û pêşketinên zanistî, bi taybetî jî bi pêşketina xebatên astronomîk dizanin ku xweza û gerdûn ne tenê ji bo mirovan e û yê di navenda gerdûnê de rûniştiye ne em in. Em nirxek ji nirxên gerdûnî ne, lê nirxê me ji nirxê bûnewerên din ne mezintir e. Lewra gerdûn di xwezaya xwe de wekheviya etîk û estetîk dihewîne.

Du rêgezên ekolojiyê hene. Yek, nirxê xwezayê ye û li hember bandora mirov a li ser xwezayê ava bûye. A din jî redkirina serweriya mirov e, vê serweriyê napejirîne.


Gelek tevger û rêxistinan rêgeza duyemîn, yanê rêgeza ku serwerî û serdestiya mirovî ya li ser xwezayê red kiriye û ji bo wan di mijara ekolojiyê de mirov li ser her tiştî ye. Weke ku diyar e, ev yek bi xwe re nakokiyên mezin tîne. Lewra di bingeha qeyranên ekolojîk de jî ev nêzîkatî heye. Li cihê ku serwerî mewcûd be mêtinkarî bêsînor e. Bi heman şiklî hin tevger bi vê nêrînê rêgeza yekemîn esas nagirin. Di pirsgirêkên xwezayê de bandora mirovan piştguh dikin, bingeha pirsgirêkên dûrî hişmendiya mirov, li cihên cuda digerin.

Bi saya felsefeya kuantûmê jî em hayîdar dibin ku gerdûn bi vê yekê di hêla form û enerjiyê de bi ahengeke bêhempa tevdigere. Cara yekem mirovê xwedî hişmendiya pederşahî berovajî vê ahengê tevgeriyane. Pirsgirêkên xweza û civakê jî li ser vê nakokiyê mezin bûne. Lewma lêgerîna çarenûsa pirsgirêkan jî divê ji vir dest pê bike. Gihîştina heqîqeta ekolojîk encax bi destşûştina ji nêrîna ku mirovî di navenda gerdûnê de dibîne gengaz e. Di şîroveyên me yên derheqê xwezayê de bi gelemperî ev nêrîn mewcûd e. Dema gihayekî kûvî li ser axê belav dibe, em wê belavbûnê wek bêarî şîrove dikin lê li bêariya xwe nanêrin. Dema cûreyeke masiyan masiyên din dixwe em vê yekê wek kuştinê û wan cure masiyan jî wek kujer bi nav dikin. Lê em li kujeriya xwe nanêrin. Dema hejmara cureyekî kêzikan di nav erd û zeviyan de zede dibe, ew kêzik ji bo me dibe vegirox, lê em ji talankeriya xwe behs nakin. Dema em dîmenên nêçîran temaşe dikin û dibînin ajalek goştxwar nêçîrê dike û nêçîra xwe dixwe mahdê me tirş dibe û em ajalê goştxwar weke "wehşî" pênase dikin. Lê berovajî,


Ernst Haeckel



# jiyana ekolojîk



dema em daristanan tine dikin ew nabe talankerî. Dema em nifş û cinsê ajalan qir dikin ew nabe mêtinkarî. Dema em di karxane, cotgeh û fabrîqeyan de zextê li ajalan dikin ev yek me aciz nake. Lewra ev hemû tiştên asayî ne. Ji ber ku em serwerên gerdûnê ne, her tişt ji bo me pêkan e û em her tiştî ji bo xwe wek heq dibînin. Ev nêrîn bi temamî dijberî heqîqeta ekolojîk e. Gava ku şîroveya me ya Heqîqeta Ekolojîk bi vê bingehê be, di qeyrana ekolojîk de em para xwe nabînin, an jî naxwazin bibînin û xwe ji jiyaneke ekolojîk çi bi zanebûn çi jî bi nezanîn dûr dixin.

Mirov hemû taybetmendiyên xwe yên derxwezayî bi rêya ajal û zindiyên din meşrû dikin. Lewra em, yanî mirov di ferqa biyanîbûna xwe de ne û dizanin ku zindiyên din xwezayî ne. Encax bi tevgerên wan em dikarin şîroveyên xwe meşrû bikin. Şîroveyên bi vî rengî ango nêrînên ku xwezayê di qefesa mirovatiyê de dibînin di hişê me de ewqas rûniştine ku êdî şîrove û nirxandineke derveyî van nêrînan ji me re zehmet tê.

Divê em di şîroveyên xwe yên derheqê xwezayê de mirovî di navendê de nebînin. Averebûn û biyanîketina ku mirov dijî meşrû nekin. Gelek bername, pirtûk, çîrok, û hwd. yên derheqê xwezayê de bi vê nêrîna hiyerarşîk hatine nivîsîn. Mirovatî, çanda xwe jî weke serkeftinên li hember xwezayê îfade dike. Xweza, bi taybetmendiyên mirovan yên derxwezayî tê şîrovekirin. Wek ku ew taybetmendî jî xwezayî ne tên meşrûkirin.

Helbet ev nêrîn ji nişka ve peyda nebûne. Bi gelek rê û rêbazan ev hişmendî di çanda me de hatine bicîkirin. Em dikarin li ser vê meseleyê fablên La Fontaine wek mînakek biçûk bidin. Bi guhdarkirin û xwendina van çîrok û fablan em kengê şêrekî bibînin di hişê me de îmaja wî wek keyê daristanê zindî dibe. Heçku hemû daristan di bin hiyerarşiya şêrî de dijî. An jî em eletexmînî belgeseleke ajalan vekin û temaşe bikin, hemû rave û şîrove bi temamî tevlî nêrîneke hiyerarşîk dibin. Helbet dema bi vê nêrînê ev tişt werin xwendin û temaşekirin dê hemû pevçûna hiyerarşîk a mirovan di çavê me de meşrû bibe û jiyaneke derveyî wê ango jiyaneke wekhev, exlaqî û polîtîk ne gengaz were dîtin. Lê em îro dizanin ku hiyerarşî, şerê jiyanê, averebûn û biyanketina hişmendiya mirovan e û derxwezayî ye. Lewma dema em xwezayê şîrove bikin divê em nêrîna xwe bi qasî xwezayê fireh bikin û derveyî taybetmendiyên mirovî -ên derxwezayî- li xwezayê binêrin. Divê em kincên mirovan li xwezayê nekin.

Belê; ji bo jiyana ekolojîk esasgirtina heqîqeta ekolojîk ferzeke giring e. Ger heqîqeta ekolojîk bi nêrîneke gerdûnî were nirxandin dê fêmkirina jiyana ekolojîk û avakirina wê gengaztir be. Gelek aktivîstên xwezayê, xwezaparêz, ajalparêz û hwd. ji ber ku di nêrîn û nirxandinê de teng dimînin, di nav nakokiyan de digevizin. Jiyan û polîtîkayên wan li hev nayên. Weke mînak; ajalparêzek ku mafê ajalan ê jiyanê diparêze di heman demê de dikare bi kêf xurek û tiştên ku di encama îşkence û esareta ajalan de hatine afirandin û çêbûne bixwe. Ev jê re asayî dixwiyê. An jî li mafê kûçik, pisîk û ajalên hatine kedîkirin digere, wan diparêze lê mafên kulî, mişk, cirnîs û hwd. jê re ne xem e. Lewra ew ajal xîtabî çavên wî/wê nakin û ajalên kedîkirî bêhtir nêzî mirovan in, bi hin taybetmendiyên xwe dişibin mirovan, yên derveyî wan dimînin paşguh dikin. Îhtimalek e ku ev yek ji ber feydegirtina ji ajalên kedîkirî be jî. Yanê mirov, xwedî li mafê ajalên ku di bin desthilatdariya mirovan de dijîn dertê. Ev jî tê wateya kolonîkirina jiyana wan ajalên kedîkirî. Ev yek nêrîneke wek 'hestê van ajalan bêhtir hene û ajalên din -bi taybet jî yên biçûk- ne xwedî tu hestekê ne' derdixe holê. Lê belê zanyaran li Kalîforniyayê kişf kirine ku mêş jî xewnan dibînin. Dîsa gelek zanyar bi xebatên xwe gihîştine wê encamê ku dar û nebat jî hîs dikin û difikirin. Ger jîrekî ango zekaya xwezayê tine bûya dê çawa bikariya ahenga xwe ya bêhempa biparasta. Di vir de diyar e ku divê mirov hîs û jîrekiyê jî weke ku mirov ji bo serdestiya pergala xwe bi wate kiriye nexwîne. Wateyeke din ji bo van her du têgehan jî divê. Ji ber ku jiyana xwezayê ne bi qasî sînorên çavên me û dîtbariya me belawela ye. Xweza ahenga xwe bi jiyana holîstîk diparêze. (Ji bo bi awayekî hûrgilî tehdeya ku li ajalan tê kirin bibînin, hûn dikarin li pirtûka Peter Singer ya bi navê Azadbûna Ajalan binerin.)



**Wêne:** *Kêzik û Kulîlk, Ju Lian*

> Em îro dizanin ku çavkaniya pirsgirêkên xwezayê hişmendiya derxwezayî ya mirovan e. Em bi saya felsefeya zanistê ya nûjen û pêşketinên zanistî, bi taybetî jî bi pêşketina xebatên astronomîk dizanin ku xweza û gerdûn ne tenê ji bo mirovan e û yê di navenda gerdûnê de rûniştiye ne em in. Em nirxek ji nirxên gerdûnî ne, lê nirxê me ji nirxê bûnewerên din ne mezintir e. Lewra gerdûn di xwezaya xwe de wekheviya etîk û estetîk dihewîne.

Dîsa hin xwezaparêz daran diparêzin lê zindiyên din naparêzin. A rast ger em cihê xwe yê li xwezayê bizanin û bi awayekî mêtinkar nêzîkî xwezayê nebin, hewcedariya parastina xwezayê jî namîne. Jixwe hewcedariya xwezayê bi parastina me tine ye. Li gorî hemû êrîş û tehrîbkariya me jî ew bi parastina cewherî zindî dimîne. Di encamê de dema em dibêjin "xwezayê diparêzim" em dîsa wê ji xwe diparêzin. Lewma ya hewce; divê em bikarin di têkiliya xwe û xwezayê ya diyalektîk de pêwendiyeke simbiyotîk bijîn. Ev jî bi gihîştina xweza û cewhera xwe re gengaz e; bi fêhmkirina wateya jiyanê, xwerizgarkirina ji sînorên nefs û ajoyan.

Heqîqeta ekolojîk gerdûnî ye. Girêdayî parçeya herî biçûk a gerdûnê ye. Di gerdûnê de biçûkbûn û mezinbûna forman nirxê tiştan diyar nake. Ger parçeyên atomê elektron, proton, notron, kuark û hwd. tinebûna dê atom jî tine bûya. Ger atom tine bûya dê element, ger element tinebûna dê molekul, molekul jî tine bûna dê made û form jî tine bûna. Ango masiya biçûk tine bûya dê masiya mezin jî tine bûya. "Armanca madeyê biwatebûn, armanca wateyê jî ji madeyê derbaskirin e" gotiye Birêz Ocalan. Di gerdûna ekolojîk de armanca hemû parçeyan parastina hebûna hevdu ye. Lewra "armanca gerdûnê azadî ye." Armanca hemû gerestêrkên gerdûnê jî azadî ye. Lewma her yekî ji wan bi hebûna xwe parastina hev kiriye û bi parastina hevdu jî parastina xwe kirine û dikin. Ger berovajî vê bibe û roj xwe nêzîkî gerestêrkên li dora xwe bike dê hemû gerestêrk tine bibin. Roj jî wê bi tenêtiya xwe gav bi gav tine bibe. Lewra gerdûn tenêtiyê napejirîne.

Mirov bi hişmendiyeke pederşahî dibêjin "Serwerî qanûna xwezayî ye." Ger ev rast bûya dê vebeyna wê li gerdûnê jî hebûya û li gerdûnê jî serwerî mevcûd bûya. Ango di şûna hebûna hevparastinê dê tinekirin hebûya. Lê belê ev nabe, xweza jî tevî hemû êrîşan wek gerdûnê ahenga xwe diparêze. Lewra wekî gerdûnê, armanca xwezayê jî azadî ye. Ger qanûneke xweza an jî gerdûnê hebe ew jî encax dikare azadî be. Divê heqîqet û jiyana ekolojîk ya ku ji aliyê mirovan ve tê pênasekirin bingeha xwe ji azadiya gerdûnê bigire. Ev encax bi nêrîneke bi vî rengî pêkan e.

***Girtîgeha Jinan – Sîncan - Enqere**

Vê sibeyê piştî ku roj hilê...
Min awêne danî û gulîyên xwe çil û çar kezî vegirt...
Enîya xwe ya gever çend morîkên mircan pê de berda...
Kirasekî ji çil û çar rengî li ber bedena xwe girê da...
Rawestîyame li şaneşînê.
Ji dûr ve xuya ye çîyayekî bejinbilind.
Vê zivistanê...
Êşekê xwe li peravên dilê min asê kiriye.
Gulîyên min vebûne...
Morîkên min yên rêzikî belav bûne...
Kulîlkên rengrengî yê kirasê min çilmisîne...
Awêneya min şikestiye
û min xwe wenda kiriye li cihekî ku tu kes pê nizane...

**Eyşana BERAVÎ**



WÊNE:DEWRÊŞ ELÎ